

•

ÊLÎ HERÎRÎ

•

Abdusamet Yîgît

Weşanên han

·
·
·
·
·
*Êlî Herîrî*Abdusamet yigit*
@han-grafik-Abdusamet yigit
Çap 2

Berlin/Avrêl-2011

Weşanên HAN -68

Roman-37

Edîtor : Zeynel Abidîn Han

Berpîrsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran

Grafîk û Design : Gazîn Han

·
email: han-grafik@hotmail.de

·
Çap û Grêdan :

HAN-GRAFIK Verlag & Werbeagentur

Bülöwstr. 56-57 10783 Berlîn

· [Tel:0049\(0\)3023552540](tel:0049(0)3023552540)

Fax:0049(0)3023552541

ISBN 978-3-942735-16-2

ÊLÎ HERÎRÎ

.. Li dergahê ew demek bû ku çûn û hatinaka mazin hebû. Ji gelek der û deverên dûr û cûr mirov dihatin ku şêx Êlî bi bînin. Şêx Êlî ji, dergaha wî li Şamzînanê bû. Ew biaslê xwe ji ji wir bû. Malbata wî li wir pir bi hêz û mazin bû. Şamzînan, ji aliyê rojhilatê kurdistanê ve ji, mirovên ku dihatina wir ku şêx bibînin û destê wî maç kin hebûn. Ew şêxekê ku mazin bû. Zanebûna wî ji pir mazin bû. Ew xwediyê dergahaka mazin bû.

Dergaha wî, mirov ne dikarî tenê jê re bêje ku dergah bû. Ji wê zêdetir ji weke navendekê pwerwerdekirinê bû. Ji gelek herêman mirovên ku dihatina wir hebûn.

De ne, mirovên ku xwanda bûn û zanebûn, her timî di gerekê de bûn. Li herêmê ji, her weha wilo bû. Vêca ku mirov bahsa herême Botanê û Şamzînanê bike, mirov divêt ku hinekî zêdetir vê yekê bi wan re bêne ser ziman. Ji ber ku li vanderan bêhtir çûn û hatinaka mazin hebû. Bi teybetî ji, Cizîre bota navendeka wilo mazin bû ku bigotina nayê vegotin. Hingî mazin bû û li herêmê bi rêz û bi nirx navê dihat ser ziman.

Şamzînan, di dereke wilo de dima, ku ne dûrî Cizîre bota dibû û ne ji dûrî aliyê rojhilat dibû. Pêre mirov karê başûr bêne ser ziman. Ji xwe, aliyê başûrê kurdistanê ji, tevgerê mazin têde hebû. Çûn û hatinaka mazin lê hebû. Bi teybetî ji botanê bi ber Zaxo ve çûyin pir zêde dibû. Ku mirovên ku diçûn û xwe digihandina Zaxo, êdî ji wir ji, ku xwe negihandiban herêmên din yên kurdistanê ji ne dibûn. Zaxo, dereke ku hinekî girîng dihat dîtin. Dereke ku dora wê hemû dar û daristan bû. Lê di wê cihê xwe de ji weke bajarekî pêşketî dima. Ji gelek herêm û deverên herêmê yên û etartî û bi vî awayî bazirgantî dikirin riya xwe bi wir ji dixistin. Mirovê ku etar bû û bazirgan bû, ne mumkun bû ku herêm baş nasnekirana. Herêm ji her alî û deverên xwe ve ji nas dikirin. Deverên ku pir qalabalix bû ji, li wanderan sefer dikirin û li wanderan dikirin ku malên xwe yê firotinê bi firosîn.

Ji Cizirê, ji ber Diclê pir tişt diçûna herêmên din bi riya etar û bazirganan. Ji aliyê naskirina xaliçayan, û çêkirina mahfûr û merşan û tiştên wilo û hê gelek tiştên din hebûn. Yên ku bazirganti dikirin, her timî di xwestin ku tiştên ku diketina berwan de bi nîvbahayekî bikirin û piştê deverên ku ew tiştê birinê de bi bahayekî pir mazin bifiroşin û jê qazancekê bikin. Her weha ev yek ji, kar û barê etar û bazirganan bû. Ji Cizîrê û Nisêbînê, her timî her weha çûn û hatinaka mazin hebû.

Ne tenê ji herêmê her weha tişt diçûna herêmên din ji bo firotinê. Ji herêmên din ji, her weha ji bo firotinê tişt dihatina van deveran. Ji ber ku ev dever pir qalabalix bûn û dewlemendiyaka mazin li van deveran hebû. Ji aliyê Hindîstanê ji qûmaş û tiştên wilo dihatina wir. Ji wir, qûmaşna hewîşmî dihatin ku mirov guneh dikir ku lê meyîzende na. Hingî xweşik û sipahî bû.

Li herêmê, ku etar û bazirganan hatina van deveran, êdî piştê, ne bi gelekî re, wan xwe digihanda Zaxo û wan deveran ji. Zaxo, dihat a bawer kirin ku navê digiha Navê neviyê Nebî Nuh *Aziyax*. Her weha dihat a bawer kirin. Bi vê yekê re, êdî girîngiyak jê ji hebû. Nebî Nuh, li Cizîre bota bû. Ew li wir jîya bû. Tirba wî heta wê demê ji hê li wir bû û dima. Hê weke ku berê çawa hatibû çêkirin hatibû parastin. Qadrek ji jê re hebû. Qadrekê ku bê sînor jê re hebû. Li wir li ber tirba wî mizgeft ji hatibû çêkirin. Mirovên ku alim ban, weke ku biçûyana hacê, carekê xwe di jiyana xwe de digihandina wir. Her weha ev yek ji hebû. Di wê heyemê de Şêx Êlî ji, gelek caran ku li dora wî gelek sofî û mirîdên wê pêre hebûn çûbû bû wir û li wir ji demeke dirêj mabû. Mirovên wilo ku diçûna wir ji, ku ji aliyê mîrê bota û qasra wî ve baş hatiban pêşwazî kirin, di nav xalkê de li ser wê pir mazin dihat a axiftin û bahs dihat a kirin. Li ser wê yekê pir dihat a axiftin, êdî. Ji ber vê yekê, deme ku yekî weke mirovên wilo mazin biçûyana wir, êdî piştê ku ew divegerehan ji, dihat a pirsîn ji yê li dora wan yê ku bi wan çûbûn û bi wan re bûn, ku ka mîrê bota çawa nêzîkatî li wan kir û dana pêşwazî kirin. Ev yek her weha wilo bû û pir ji li ser dihat a sekinandin. Ew pêşwazîkirina ku mîrê bota dikir ji, ne tenê ji rêz û hûrmete wan mirovan dihat a zanîn û hasibandin. Her weha ji ya mîrê bota û qasra wî ji dihat a hasibandin. Mîrê bota mazin bû. Ew weke şêxekî bi nav û deng û bi rêz û hûrmet bû. Û weke mîrekî mazin yê kurdistanê ji di nav xalkê de xwedî nav û rêz bû. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybetî bêne ser zimên. Mîrê bota, rêze wî ya ku ji mirovên weke Şêx Êlî ji re ji rêz û hûrmete wî dihat a

zanîn û hasibandin. Ew mîrê bota bû. Mîrê bota, weke din ji mîrê warê Nebî Nuh ji bû. Ev yek ji, biqadrî dihata pêşwazî kirin.

Şêx Êlî, mirovekî ku wilqasî bizane bû, navê wî bi zanebûna wî li herçar aliyên kurdistanê deng veda bû. Navê wî hatibû bihîstin. Lê di vir de di sêrî de mirov divêt ku vê yekê bêne ser ziman û bêje ku zimanekî wî ku mirov bi teybet bêne ser ziman hebû. Kurmanciyaka wî ya pir baş û safî hebû. Bi vê yekê, her weha divêt ku mirov xosletekî wyê pir girîng ji bêne ser ziman.

Şêx Êlî, di dergaha wî de li ber destê wî ji, gelek mirovên ku dixwandin hebûn. Ew mirov hemû, faqiyên wî bûn. Yên ku li ber destê wî dixwandin bûn. Lê Di wê heyemê de kurekî wî yê ku bi navê Qêsim ji lê dihata bakirin, lê bi teybetî ji bi navê qalkê xwe herîrî dihata ser ziman ji hebû. Ew her weha bi dawiya navê wî ve dihate kirin û ew dihata bi nav kirin. Ew ji her weha jê re dihate gotin *Êlî Herîrî*. Lê Êlî navê wî bavê wî kurî ji bû. Lê kurekî aqilekî mazin di serî wî de hebû bû. Kurekî ku weke ku di nav xalkê de ji dihata gotin "pir jîr û bifahm bû". Her weha lê bahs dihate kirin. Ew kur ji, di wê heyemê de li cem bavê xwe perwerde di dît, weke gelek mirovên ciwan yên ku di wê demê de li cem bavê wî bi perwerde dîtîne dixwandin. Lê ew kur, bi tememî weke bavê xwe xweş û xweşik diaxift. Di nav xalkê de, pir axiftina wî bi awayî dihata acibandin.

Ew diaxift, yên ku li dora wî bûn, tenê hema wilo lê dihisandin. Bi axiftina wî ya ku wî li ber mirovên li dora di dikir de, her kesek weke ku ji xwe diçû li wan dihat.

Ku diaxift ji weke ku helbestekê ji dora xwe re bixêne li mirov dihat. Her weha mirovekî ku xweşgotin bû di axiftina xwe de.

De ne, divêt ku mirov bêje ku ziman, di wê demê de bi xweşik axiftinê rastî eleqeyeka pir mazin dihat. Yên ku zanebûn, ku di civatna de dirûniştin, li zimanê wan dihata meyîzêndin ku ka çend baş û xweşik dizanîn biaxivin. Ku baş zanîban biaxivin, êdî piştê di derbarê wan de ew têgihîştin çêdibû ku ew pir bizane na. Her weha li wan bahs dihata kirin.

Di wê heyemê de, li kurdistanê ji, serwerî û serdestiya *Merwaniyan* hebû. Merwaniyan, piştî ku dewleta kurd ye bi navê Şadadîyan ji ber hêrîşên dordorê yên lê û bi teybetî ji hêrîşên salçûqûiyên ku bi kom bi kom dihatina herêm ketibû. Xuraha bû. Piştê ne bi gelekî re dewlete Merwaniyan, temenê wê ji aliyê Badê Kurê Dostik ve hatibû avêtin. Lê ew piştê ku bi awayekî bi xayînî hatibû kuştin, êdî birazîyê wî Alîyê kurê Merwan bi mênên û zanebûna xwe cihê amê xwe vala ne hiştibû û

dewlet ava kiribû. Ew di wê heyemê de ji li şahitiya wî bû. Ew hê şax bû. Lê pir ji pîr bû. Li ber destê ji, wezirê wî yê ku bi navê Şero heta ku tê gotiba bizane bû. Lê ji gelek aliyên ve ji baş û qanc ne dihata naskirin û zanîn ji aliyê xalk ve di nav xalkê de. Lê tenê ew aqildanê wî Aliyê Kurê Merwan hebû. Ji wî zêdetir hê gelek hebûn. Lê ew yekî ku pir mazin bi bandûr bû. Ew weke ku şahê dewletê bê bû. Her weha serwer û serdest bû. Her weha bi nav û deng bû. Li ber destê wî ji, weke şahê mazin mirovên ku kar dikirin hebû. Ew ne tenê aqildan û şêwirmendê şahê mazin bû. Ew ji xaynî wê jî, weke şerleşkerê an ji şerfermandarekî ji bû. Her weha ew ji mazin bû.

Merwanî serwerî û serdestiya wan li ser kurdistanê bigiştî mirov karê bêje ku hebû. Mîr û mazinên başûr û rojhilat ji bi wê re gav diavêtin. Lê bi teybetî ji giraniye dewletê li herême botanê bû. Deme ku bahsa herême botanê dihate kirin, divêt ku mirov bêje ku ne tenê ew herêm bahs lê dihate kirin. Ji xaynî wê ji, herême kurdistanê ye aliyê başûr rojavayê kurdistanê ji di nav de dihate ser zimên. Ew herêm, hemû weke herêmekê bûn. Li wanderan ji zanist û mazinên kurdan der bi der digerîyan. Heta bi Şamê ji diçûn. Di wê demê de, şam ji weke navendeka bazirganî û çandî û hizrî bû. Li wir, gelek zanistên herême her timî lev dicivîn. Ji herêmen kurdan heta ku mirov bêje ku ji herêmeke weke herême botanê ji mirovên ku diçûn û ew der di dîtin hebûn. Lê wir ji, yên ku zanistban ku ne hatiban Cizîre bota ji ne dibû. Tirba nebû Nuh li wir bû. Piştî Musulmantiyê re, weke ku mirovekî musulman herê hacê, yên zanistên musulman ji xwe digihandina Cizîre bota tirba Nebî Nuh û carekê ew der di dîtin. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi bi teybet bêne ser ziman. Şêx Êlî ji carekê dû caran deme ku hatibû Cizîre bota, êdî ji wir bi hinek mirovên ku bi wî re dikevîne rê de û dibin awlakariya mîrê bota de diçûna Şamê û wir, wê zanista wê ye ku her timî gelek zanistên mazin lê digihan hevdû dîtibû. Li wir li wan zanistan rûniştibû û bi wan re ketibû axiftin û dan û standinê de.

Ji herême, mirovên ku diçûna wa herêman li wan herêman li zanistên herêman di rûniştin û li wan bi zanistên herêman re diketina axiftin û danûstandinan de. Şêx Êlî bixwe ji, deme ku çûbû bû Şamê, hingî li wir bi zanist û aqilmendên li wir ku levcivîbûn bi wan re ketibû axiftin û danûstandinan de. Demeke xwe ye dirêj li wir bi vî awayî buhurandibû. Piştî vegerehe bû. Deme ku vegerehe bû ji, pêşî ne vegerehe bû Şamzînanê. Pêşî vegerehe bû û hatibû Cizîre bota û li wir ji di wê demê de ji hinekî dî ji mabû û piştî ji wir êdî vegerehe bû Şamzînanê.

Deme ku vegerehe bû, Şamzînanê ji, li wir bi kêf û şahî hatibû pêşwazî kirin. Li Şamzînanê, li wir, dergaha wî li wir hebû. Li dergaha wî ji gelek mirov li wir lê diman. Mirovên ku li wir lê diman ji, axlabe ji, mirîdên wî û faqiyên ku li cem wî dixwandin bûn. Mirovên li wir jê aqil digirtin bûn. Şêx Êlî, mirovekî ku pir mazin bizanebûn bû. Ew, di zanebûna xwe de pir mazin bû. Li herême seyde û mîrên ku hebûn ji dihatin û li dîwana wî lê dirûniştin û jê aqil digirtin. Wî ji aqil dida wan. Wî ji wan re bi zanebûna xwe digot ku ka wê çî bikin.

Ew li wir, weke navendekê bû. Wilo mazin bû. Li wê herêmê di wê heyemê de, dergaha Şêx Welîdê Sêrtî ji mazin bû. Ew ji xwûdê rehmate xwe lê kê. Mirovekî ku mazin bû û bizanebûn bû. Ew ji di wê demê de dijî. Şêx Welîd, ku me li vir bahsa wî kir, divêt ku em ji bîr nekin û bibîr bixin ku wî pir nivîsandibû. Nivîsên wê heta ku gihîstibûna Dergaha Şêx Êlî bixwe ji. Li wir ji, ji aliyê mirîd û faqiyên ku hebûn ve dihatina xwandin. Ew mirovekî ku bizanebû. Ji zanebûna wî ji ti şik û gûmana ti kesekî ne bû.

Şêx Welîd ji, weke Şêx Êlî xwedî dîwan bû. Ew ji bi vê yekê ji dihat ser ziman di nav xalkê de. Di nav xalkê de, ji xwe jê re rêz û hûrmeteke mazin hebû. Navê wî bi rêz dihate pêşwazî kirin. Ku navê wî dihate ser zimên, weke navê yekî pîroz werê ser zimên dibû. Her weha mirov divêt ku wî ji mazin û bi nirx bêne ser ziman.

Şêx Êlî ji xwedî dîwan bû. Ew ji dîwana wî di nav mirîd û faqiyên wî yên ku li wî dixwandin û diman de dihat ser ziman. Wan, ew di her demê de di bîr û hiş de dihişt.

Şêx Êlî, piştî ku ji Şamê vegerehe bû Cizîrê û li Cizîrê ji li qasra mîrê bota ku hatibû hiştin ku mabû, piştî ne bi gelekî re tê Şamzînanê. Ku tê wir ji, êdî li wir ji, ew zêde li ser xwe namêne û piştî dikeve nava nivînan de. Piştî ku dikeve nava nivînan de, êdî ew hin bi hin nexweşiya wî giran dibe. Roj bi roj ji nexweşî lê zêdetir dike. Ew her weha êdî piştî ji wê ketina rizgar nabê û diçê ser dilovaniya xwe di wê heyemê de. Piştî ku ew diçê ser dilovaniya xwe, êdî weke ku wê bihate kirin, êdî kurê wî Êlî Herîrî tê dewsa wî û li dewsa wî dirûnihê. Ew êdî li cihê bavê xwe di rûnihê. Ew piştî ku tê û i cihê bavê xwe di rûnihê êdî weke ku ji bavê wê re dihate gotin Şêx tê gotin. Piştî ew wilo dibe Şêx Êlî Herîrî. Şêx Êlî Herîrî, êdî wilo dibe û mazin dibe li dergahê li dewsa bavê xwe li cihê wî.

De ne, divêt ku mirov ji bîr neke û bêje ku di şêxitiyê de weke kevneşopî bû ev yek. Kengî şêx diçû ser dilovaniya xwe, wê kurê wî û an

ji ku kurê wî nema bin, êdî wê birayê wî û ew ji nema bin wê kurê birayê(n) wî werine dewsa wî. *Her weha yê ku bihate dewsê ji, divîyabû ku ji xwîna şêxê ku çûbû bû ser dîlovaniya xwe di wê heyemê de.* Êlî Herîrî, deme ku heta desa bavê xwe hê hingî ne wilo zêde mazin bû. Hê ciwanekî ku ji nû ji deme xwe ya faqatiyê derketibû bû. Lê hê xwandinê piştî wê demê ji ne kiribûn. Hê ew xwandinên wî ji mabûn. Lê wê xwandiba. Ev yek pir girîng e. Divêt ku em hinekî li ser bisekin in.

Di deme xwandinê de, sê demên pir girîng ku mirov ew fahm kiriban hebûn. Ew hersê dem ji, deme pêşî deme ku mirov ji nû bidest xwandinê dikir û kuran bi awayê xwe yê arabî û bi kurdî dihate xwandin bû. *Ji awayê arabî re bisiraxwandin dihate gotin. Lê ji awayê bikurdî re ji dihate gotin ku 'hicrî' û an ji 'kurdî' dihate gotin.* Di awayê kurdî de, di xwandinê lavz bi lavz dihate xwandin. Her weha, her tîp û bêje û hevok dihate xwandin. Ev yek, di wê heyemê de li dergahê dihate fêrkin. Ev kar karê seydeyan bû ku fêrî faqayên ku dixwandin bikin. "Ku ew awa ne hatana fêr kirin, weke ku di fêrbûnê de kêmesîyek hebe dihat dîtin". Her weha ev yek pir girîng bû.

Di xwandinê de, deme pêşî, her weha ji demên bûyin û pêşketin hebû. Piştî ku ew dem heta bidawî kirin wê buhurîna deme duyem bûyin bûba. Ew dem ji, wê êdî bidest xwandin û di xwandinê de li wate lêgerînê bihate kirin. Ev dem, demeke ku jîrbûn û an ji nejîrbûna mirov kifş dibû. Êdî wê li gor wê yekê nêzîkatî bihate kirin. Ev dem wê bi hinek pêvajoyan re wê heta deme ciwanbûnê wê hebûna xwe bide berdewam kirin. Heta ku mirov balix dibû berdewam dikir. Ev dem, deme ku mirov li Dergahê her roj dixwand bû. "Di wê demê de wê gelek pirtûkên hizir û yên tevsîrê bihatan xwandin".

Deme piştî wê demê re, demeke ku mirov wê deme weke demeke bûna seyde an ji her weha di wê astê de mazin bûnê bû. Wê êdî binirxbûn bûba. Wê êdî li civatan wê lê bihata hisandin û wê li aqilê wî bihate hisandin û wê bihate fahm kirin ku ka ew çendî fêr bûya di deme xwe ye xwandin û zanînê de. Di vê demê de, axlabe bi rîyan ketin hebû. Yên ku di wê demê de bixwesta hinekî dî hê mazin mazin bûba wê biketa rîyan de û çûba deverna din. Minaq, weke ku ji her herêman mirovên ku di gihîştina wê deme xwe dihatina Cizîre bota û li wir demeke xwe ye dirên dibuhurandin. Li wir, derfetê pir mazin pêşketinê hebû. Ji ber ku zanist hemû yên ku mazin bûn, li wir levdigihîştina hevdû. Her zanistên ku hatibû Cizîre bota, axlabe wan, li wir, ji xwe tiştek hiştibû ku têde hizir û ramana wî dihate ser ziman. Şêx Êlî bixwe ji di deme ku li wir mabû de

her weha ev kevnêşopî xira ne kiribû û li wir biçêk ji zanebûna li ser hiştibû. Ev yek ji, her divêt ku mirov wê bi bal bêne ser ziman.

”Di di deme balixbûnê de, zanebûn, êdî mirov bi rê ve dibe”. Di wê heyemê de wilo bû. Di nav xalkê de ji ev gotin. Pir bahsa zanebûnê dihate kirin.

Di her demê de wilo bû û di wê demê de ji wilo bû, ku mirov dixwest ku xwe nêzîkî cihê zanebûnê bikira hingî xwe nêzî dergahan dikir. Dergah, cihna ku têde her timî aqil hebû bû. Aqilê civakê û yê ku di nav xalkê de bû ji, li wir lev digeha hevdû.

Şêx Êlî Herîrî, mirovekî hê ciwan bû ku hatibû dewsa bavê xwe di wê heyemê de. Lê ew di wê heyemê de bi jîrbûn û aqiliya xwe ya mazin, zû bi pêşve diçû û pêş diket. Di nav xalkê de ji, ew zanebûna wî ye ku hebû hê ku di wê deme xwe de bû, li ser dihate axiftin. Bahsa wî dihata kirin. Bahsa zanebûna wî dihate kirin. bahsa aqilê wî dihate kirin.

Ew ku hinekî li dewsa bavê xwe dimêne, êdî piştê di demeke kin de ku hê ciwana ji, weke mirovekî ku mazin a, biazil dibe û derdikeve pêş. Navê wî ji wilo êdî derdikeve. Hê ku ciwan a, ew dîwana xwe bidest afirandina wê dike. Vê yekê ji her weha divêt ku mirov wê yekê bi teybet bêne ser ziman. Ew xosletên zimanê kurdî kurmançî yên ji lev hanînê re ku pir başin, wî ew bi têgihîştin kifşkiribûn û bi wan deme ku diaxift, axiftinaka pir xweş û xweşik dikir. Ew bi vê yekê di deme xwe de pir mazin derdikeve pêş. Bi zimanê xwe re ew derdikeve pêş. Deme ku mirov bahsa wê awayê axiftina wî bike, divêt ku mirov hinekî bi teybet li ser bisekinê. Divêt ku mirov hinekî bi teybet awayê axiftina wî bêne ser ziman. Zimanê Êlî Herîrî ku newê fahm kirin û di derbarê wê de ti têgihîştin çênebe, wê di têgihîştine di derbarê wî de ji têgihîştineka wilo mazin ku bidest bê girtin wê nebe. Zimanê wî yê ku mirov wê bêne ser ziman, ew ziman, zimanekê têgihîştî bû.

Deme ku em bahsa zimanê wî dihizirin, tiştê ku pêşî derdikeve pêşiya me, her weha ew têgihîştina wê ya ku bi wê zimanê wî re bûya yek a. Ew bi têgihîştineka mazin a. Lê ew di serê xwe de li ser zimên ji xwediyê têgihîştineka mazin ya dîrokî ya. Bi vê yekê re girîngiya zimanê wî derdikeve holê. Zimanê Êlî Herîrî, zimanekî bizanebûn. Lê tiştê ku ev zanebûn pê radixista berçav, her weha ew zanebûna wî ya ku wî bi têgihîştina xwe di têgihîştine li ser zimanê xwe re di serê xwe de bû yek. Ev yek her wha tê berçav. Lê bi vê yekê re tişteke dî ji pir bi bal tê berçav. Ew ji her weha ev e. Ew ji bo ku xweşik biaxivê. Di serê xwe de pir mazin li ser zimên dihizirê. Dixwezê zimên fahm bike. Ev yek û kirin

pê re heya. Di deme ku têne ser ziman ji de, bahsa giringiyeka zimên ya ku mirov di deme têgihiştina xwe de bigirê dikir. Ev yek ji, her weha pir bi bal dihata berçav. Ew deme ku dihizirê her weha hizreke xwe dihanî ser ziman û pişt wê re bahsa zimên dikir, dîse. Di got ku "mirov li dinyê dijî, divêt ku mirov dinya baş û qanc fahm bike. Lê divêt ku mirov jibîr neke ku zimanê mirov yê ku mirov diaxivê ji pîroz a. Ew ji ber ku deme ku mirov mir û çû cem xwûdê, wê hingê ew ziman bê zimanê me û wê hingê ew ziman wê ji me re bê ziman. Lê divêt ku mirov vê ji ji bîr neke, çi gotina ku ji deve me derket di deme ku mirov axift de, wê ew gotin ku çi û çawa ji bê, wê newê ji bîr kirin. wê ew li dinyê bi me re bimêne. Lê ku mirov çû dinya din ji, wê giyana wê gotinê ji bi me re were. Lê ew gotin dinyê ne berdê. Ji ber ku li dinyê hatiya dinyê. ..."

Her weha dihanî ser ziman di deme ku diaxift de. Bi vê yekê ew bi têgihiştinê nêzî zimên dibû. Ew têgihiştina ku ew pê nêzî zimên dibû ji, wî pê, deme ku diaxift de, ziman dikir ku bigotinên ku werine ser ziman re xweş û xweşik bike. Bi vê yekê, divêt ku mirov bêje ku wî bi nêzîkatiya xwe li zimên re pîrozîyek weke ku li zimên baxş dikir.

Êlî Herîrî, li ser zimên bi vê yekê mirov karê bêje ku xwediyê têgihiştineka teybet bû. Ew di farqa têgihiştina zimên de bû. Bi wê têgihiştina ku di farqê de bû li ser zimên di hizirî û têgihiştinêji, ku diaxift, dihanî ser ziman. Ew deme ku diaxift, bahsa têgihiştina "xweşik axiftinê" dikir. Gotina xweşik axiftinê, biqasî ku em têdigihin, di nêzîkatiya wî de û di hizre wî de xwediyê cihekî ku pir girîng a. Ew Ew di nêzîkatiyaka ku mirov bi gotinaka wî bêne ser ziman "mahbûb" de di axiftina xwe de. Gotinên weke "nezif", "bilbil", "Gulistan", "Sosin", "aqil", "hiş", "hûsn" û hwd, hinekî ji wan bêjeyên ku wî di axiftina xwe ye ku dikir ku xweşik û sipahî bike yên ku bi kar dihanîn bûn. Hê weha gelek gotinên ku wî bi teybetî dihanîn ser ziman hena. Ev gotin û bêje, di zimên xwe ku mirov lê dihizirê, hinek gotinên ku xweşikbûnaka bi dîtîne û aqil tênine ser ziman in. Lê di devê Êlî Herîrî de hinekî wate wan kurtir têne ser ziman. Mirov karê vê yekê ji her weha bu teybet bêne ser ziman.

Ji aliyê hizir ve, "aqil û hiş bûna .." wan, bi hinek teybetmendiyên xwe pêre hene. Divêt ku mirov wan ji kifş bike. Di deme ku bahsa 'aqil û hiş' dike de, hingî weke ku ew ji têne ser ziman, "dinyê geh geh têne bîr" a wî. Ew her weha hizir dihizirê û têne ser ziman. Lê ew deme ku dike ku bêne ser ziman ji, di deme ku bêne ser ziman de, pir zirav dihizirê û li gotinên xweza digerihê û ku pê bêne ser ziman di serê xwe de. Ew her weha di nêzîkatiyaka hizirî de ya. Ew, deme ku di hizirê, li

wate û kurbûna wê dihizirê. Wate pir mazin kifş dike. Bi wê kifşkirinê re ji, dike ku bêjeyne bibîne ku pê wê kurbûna ku di serê xwe de di hebûna wate têgihîştinê de kifşkiriya pê bêne ser ziman. Ew bi vê yekê, mirov kifş dike ku tim û dayîm di serê xwe de weke ku di lêgerînekê de ya. Mirov vê yekê kifş dike. Bi vê yekê di helbesteke xwe de weha dibêje "ger hûn bibînin narê eşq/Tenî li bom zar diken,". Ev gotinên wî di xwe de hinekî ku mirov li ser dihizirê, mirov dibîne ku têgihîştinaka kur ku wî di serê xwe de kifş kiriya tînî ser ziman. Lê ew deme ku têne ser ziman ji, mirov ji gotinan fahm dike ku ew di gûmanê de ya ku wê bi tememî baş werina têgihîştin. Her weha mirov vê hizrê ji pêre kifş dike. Ew, bi vê yekê re dide rû ku ew hinekî pir mazin û kur dihizirê. Di dewama van gotinên xwe de weha hinek gotinên wî hene. "Er kes dizanet halî Eşq,/Bexil û dijvarî diken". Bi vê yekê re, mirov jê fahm dike, di têgihîştina xwe de li têgihîştin û hebûna têgihîştinê ye li dinyê lê dihizirê. Pê re ji, li jînbûna wê dihizirê. Lê pê re, mirov dibîne ku weke wê têr nabîne. Her weha ev yek ji xwe ji gotinên wê dide der. Di fahm kirinê de, vê yekê dide rû li ber mirov. Lê di deme van gotinên xwe yên ku dibêje de hinekî dî ji di berdewam van gotinên xwe de weha dibêje, "Bi halê eşq bexil dibim,/ Her dem bi dem Zelîl dibim,/ ..".Di van gotinên xwe de hinekî li ser aqil û têgihîştineka ku ew bi evînê li ser dihizirê û hizir dike têne ser ziman. Pê kur dibe û dibêje ku ew di deme de "zelîl" dibe. Her weha wê ji wil têne ser ziman. Bi van gotinên wî re, di rastiyê de tiştek bi baldarî derdikeve holê. Ew ji her weha ev a. Ew, ji têgihîştina deme xwe hinekî buhurtiya. Ew, bawermendekî mazin a. Ji xwe ew şêx a. Lê ew şêxekî ku zanebûna wî mazin a. Ew baweriya xwe ne tenê di temenê baweriyê de dijî, Ew pêre bi têgihîştin dijî. Her gotina ku ew tînî ser ziman ji, ji wê têgihîştina wî ya ku wî di xwe de daya rûnandin û pê dijî ya. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Bawerî, pêre, li ser hinek teybetmendiya di rûnihê. Ew tēybetmendî ji di temenê zanebûn û têgihîştinê de têne ser ziman. Felsefe wî di xwe de bitêgihîştin daya rûnandin. Bi wê diaxivê û têne ser ziman. Di derbarê zanebûna zanistên li dora xwe û yên deme xwe de û zanebûn û têgihîştina ku heta wê demê bi pêşketin hetiya xwedî zanebûn û têgihîştin a. Ev yek ji, wî dike xwediyê zanebûna dîrokî ku bi têgihîştine dîrokê xwe pê re dide berçav.

Dil di têgihîştina wî de ne bê wijdan a. Ew wijdan di zanebûn û têgihîştine dil de dide rûnandin. Li gor wî û zanebûna wî, biqasî ku mirov jê fahm dike, dilekî ku di têgihîştin û zanebûna xwe de wijdan nedayî

rûnandin, dilekî ku ne pêşketî ya. Mirov vê yekê ji fahm dike. Lê dil bi wî re ku di têgihiştine wî de mirov lê dihizirê, mirov hinekî bi teybetmendî dibîne. Ew dil li dinyê dibîne. Lê di têgihiştinê de hinekî ji zanebûnê dibîne.

Gotinaka xweş çawa ku dilxweş dike, bala wî dikişêne. Êşek çawa dil pir êş dike û diêşene, wê dibîne û li ser dihizirê. Lê ew deme ku li ser dil dihizirê, ne diwê hizrê de ya ku mirov ti carî nikarê di zanebûna dil de kur neçê. Ew dibêje ku mirov karê kur herê û fahm bike. Lê dil dibîne ji. Ew dîtina dil, têgihiştina mirov a. Wîlo ji têne ser ziman. Gotina wî ya ku dibêje "her kes bi xem xwarî diken"e, her weha vê yekê bi hev re têne ser ziman. Di xwe de ne tenê têgihiştinekê têne ser ziman. Bi hev re ye zanebûnê, dilkenî û xemî yê bi hev re têne ser ziman. Zanebûn, dilkenî û xemî çawa bi hev re dibê? Di vir de, bi zanebûnê mazin bi şahîbûn û deme ku kur çûyin di têgihiştine de û hê bêhtir dîtina bû ji, êdî pê re xwestina xwe gihinadina wê têne ser ziman. Lê di dawiya têgihiştina vê hevokê de, rastiyên jiyane yên ku tînin tînin ne bi êş û yên bi êş ji têne berçav. Ev ji, bi têgihiştinê de dibin. ..

Bawerî, li gor vê yekê ew dixwezê ku bizanebûn bê jiyandin. Çend ku bizanebûn heta jiyandin, wê pêşketin û têgihiştina ku tînin ji, wê mirov xwe bigihênî de. Ev yek ji, her weha tînin berçav.

Bawerî, zanebûn, têgihiştin, mirov û xalkê, hinekî bêjeyên ku di têgihiştinê de di serê wî de li duv hevdû na. Ew, di derbarê civaka xwe û cihê xwe de xwediyê zanebûnê mazin a. Bi wê zanebûnê diaxivê. Naskirin pê re heya. Lê deme ku mirov wî bi têgihiştine wî dibîne, mirov dibîne ku ew bi têgihiştinekê nêzî naskirinê dibê. Ji ber vê yekê ji, deme ku diaxivê, bi gotina dayîna holê li berçav di nêzîkatiya wî de û axiftina wî de xwe dide der li berçav.

Ew têgihiştine wî ye felsefê ji her weha di vir de xwe dide berçav. Ew têgihiştina wî ya felsefê, di xwe de hinek bêjeyên teybet dide berçav, Naskirin, hijkirin, bawerî, têgihiştin, xweşik dîtina û axiftin, xweşikkirin, çend bêjeyên ku mirov bi teybetî lê tînin gihê na. Lê di nav axiftinê wê de bi têgihiştinê ku wî dixwest diyarî berçav bike re bêjeyên xweşîkbûn û xweşikkirinê derdikevina pêş û têne ser ziman. Bi vê yekê, zimanê wî yê xweşik û mirov bi estetîkekê û têgihiştine wê lê tînin digihê dibîne.

Li gor wî û nêzîkatiya wî, bawerî bê xalk û jiyana wê nabê. Ew di nav xalkê de ya. Di xwezê vê yekê bi xalkê de bide têgihiştin. Bide bawer kirin. Lê mirov di vir de deme ku lê dihizirê, mirov tiştêkî dîji dibîne. Ew ji, mirov bawer dike û ew bi bawer kirinê di xwezê têgihiştinê bide fahm

kirin. Ev yek her weha tê berçav. Minaq; ew deme ku ”Enber li ser koşeyê,/Enber xet di xale./Xalên di şibê enberî,” têne ser zimna, di bêje ”enberê” de têgihiştina xweşikbûnê di bêjê de tînî ser ziman. Ew têgihiştin, ji ye felsefê ya. Mirov wê bi rehetî dibîne. Lê ew, di serê xwe de xwediyê awayekî ku wî têde xweşik kiriya, bi wê xweşikbûnê di mejiyê xwe de bêje û hevokan diafirîne û pê têne ser ziman. Bi vê yekê ew di bêjeyên xwe de têgihiştinekê ji dide rû li berçav. Ev yek her weha mirov kifş dike. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku wî bêjeyên xwe yên ku têne ser ziman û pê hevokên xwe diafirîne ji, wî di serê xwe de bi têgihiştineka felsefî şîştina. Mirov wê ji dibîne. Bi vê yekê, deme ku mirov wê şîştina bi têgihiştinê kifş dike û bi çî têgihiştinê hatina şîştin ku mirov kifş dike, mirov êdî digihijê têgihiştin û felsefê wî ya di serê wî de. Bi vê yekê, ew mirov karê bêje bi têgihiştinê rabûya û di awayekî ku têde dijî û pê dijî de li têgihiştinekê di wê têgihiştine ku di xwe de dayîn afirandin û rûnandin de ji lê digerihê. Mirov her weha vê yekê dibîne. Zanebûna wî ye ku di bêjeyên wî de tê ser ziman, mirov vê yekê jê pir baş û qanc fahm dike. Ew bi pergala a. Di serê xwe de pir mazin ji bi pergala a. Mirov vê yekê ji her weha dibîne. Ew di serê xwe de, ku kur diçê, mirov nikarê bi wê yekê, wî, tenê bi awayê bawermendekî bêne ser ziman. Ew, baweriyê ji wê yekê, ye ku di serê xwe de ya, jê bi têgihiştin dike û pê dijî. Her weha mirov karê vê yekê hesanî kifş bike û bêne ser ziman.

Li dinyê dijî. Di wê li dinyê jîbûnê de ji, ew li têgihiştina axîreta xwe ji digerihê. Ew bê wate najî. Ew biwate dijî. Ev bi felsefe dijî. Di nav xalkê de, deme ku tiştik bê kirin û an ji ku bûya, ew di serê xwe de dihizirin ku ka nêzikatiya wî çiya. Bi vê yekê, di serî de pêşî lê digerihin.. Li ser dergaha xwe deme ku dirûnihê ji, wan dide hizir kirin. Bi axiftinên xwe dide hizirkirin. Lê deme ku wan dide hizirkirin, bi gotinna ku ew ji wan re dibêje û hem awayê gotinê û hem têgihiştine ku têne ser ziman, dike ku ew lê bigerihin. Her weha ew mirovekî ku di nêzikatiya xwe de yekî ku perwerdekar a ji.

Êlî Herîrî, deme ku mirov li ser hizre wî û wî dihizirê, mirov rastiyaka mazin pêre dibîne. Ew ji her weha pêşketine wî ya demê ya. Wî deme xwe pir baş fahm kiriya û ji deme xwe re pêşengtiyê dike. Her weha ev xoslet pêre xwe dide berçav. Ew felsefe wî, bi têgihiştin di jiyandina bi kevneşopî re xwe li gor demê dide der. Mirov vê yekê her weha kifş dike.

Ew piştî ku hatibû hatibû dewsa bavê xwe, êdî her weha di jiyane de bidest afirandina hizre xwe kiribû. Ew, hizre wî, piştî ku heta dewsa bavê wî êdî diafirê. Lê deme ku mirov bahsa wê hizre wî ye ku diafirê mirov bike, divêt ku mirov ji bîr neke û bêne ser ziman ku ew pir mazin bi awayekî bi felsefe diaxivê. Lê ew hê ku di deme xwe ye ciwaniya xwe de ya, pir girîngiyê dide xweşik û bizane axiftinê. Li gor wî, "xweşik axiftin û bizane hanîn ser ziman jev ne dûr a." Li gor wî, ev herdû xal bi hev re bitêgihiştinê re dimeşin. "Deme ku têgihiştin bû, hingî, mirov karê bêje ku wê di serê xwe de mazin bizane û bizanebûnê ji bihizir û felefe bibe. Pêre ji, deme kudi serê xwe de bihizir bû, hingê, wê karibê xweşik û baş bêne ser ziman. Xweşik hanîn ser ziman, di serê mirov de hinek bêjeyên ku ji têgihiştine mirov a". Têgihiştina wî ya di derbarê xweşik axiftinê de weha ya. Lê demên wê yên ku ew li ser xweşik axiftinê diaxivê ji hene. Divêt ku mirov bahse wan ji bike. Ew ji girînge bi wî re. Ji ber ku ew pir girîngiyê di diyê de. Di rastiye de, deme ku mirov di serê xwe de dihizirê, mirov di serê xwe de bitêgihiştin digihê hinek hizirna. Ew ji wilo dihizirê lê ew vê yekê di deme hanîna ser ziman ye hizran de girîngiya wê hê bêhtir tene ser ziman.

Êlî Herîrî, ji ber ku ew bi têgihiştinî di wate de dixwezê kur û dûr herê, girîngiyekê wî bi vê yekê re li zimên heya. Ew deme ku dihizirê, pir kur dihizirê. Deme ku dirêj dihizirê û kur di serê xwe de diçê ji, her weha êdî digihê pir hizran. Ew êdî vir de li ser weyne zimên di sekinê û tene ser ziman. Ew, vê xalê de pirseke wî heya. Ew pir ji her weha ya. "Gelo ziman bi bêjeyên ku em dizanin û pê hizre xwe tene ser ziman çendî û çiqasî ew hizre meye ku em di serê xwe de dixwezî ku bênine ser ziman karê bêne ser ziman?". Her weha hinekî dirêj dipirsê. Ziman, di vir de deme ku mirov li ser dihizirê, divêt ku pir mazin wê têgihiştine ku mirov di serê xwe de xwe digihlîniye de karibe bêne ser ziman. Ev yek, weke xalake girîng pê re xwe dide berçav û ser disekinê.

Bi vê yekê ew hinekî kur li ser zimên bi têgihiştinê re disekinê. Ji ber ku ew vê yekê girîng dibîne. Mirov, deme ku ziman xweşik afirand û pê hanî ser ziman, hingî. wê ziman karibe rastiye bêne ser ziman. Xweşik axiftin, bi têgihiştineke weha pê re tene ser ziman.

Ew zimên û têgihiştinê, têgihiştin û felsefe, felsefe û mirov, mirov û jiyane, jiyane û pêşketinê bi hev re li duv hevdû dibîne. Bi vê yekê weke hinek bêjeyên ku her weha di rize xwe de yên ku hevdû di adilênin û bi bandûr dikin in. Bi vê yekê, nêzikatiyaka wî hizrî heya. Ew nêzikatiya wî ya hizrî, di felsefe wî de tene ser ziman. Êlî Herîrî, mirov nikarê bêje ku wî

di jiyana xwe re bènivîsandî meya. Wî di jiyana xwe girîngî daya nivîsandinê. Pir ji girîngî daya nivîsandin. Di nivîsandinê de, wê bizimanê ku mirov pê di nivîsêne re xwestiya ku "maqametekê" bi afirêne û bêne ser ziman. "maqamet" ji wî re girîng e. Deme ku mirov li jiyana wî dimeyîzenê, mirov her weha vê yekê dibîne. "Xweşik axiftin û hanîn ser ziman, wî ji nirxekî jiyana û mirovê bizane û alim di dît." Ew pir li ser xweşik axiftinê di sekinê. Bi vê yekê re mirov divêt ku bêje ku ziman, ji bo wî deriyê xweşik axiftin û hanîna ser ziman. Wî di hinek axiftinên xwe yên ji dev heta roje me hatina de, weha tene ser ziman." Ziman, rastiyeke mirov ya rastteqînî ya. Divêt ku mirov wisa bibîne. Divêt ku mirov wisa nêzîkatiyê lê bike. Ziman, pîroz a. Ji ber ku xwûdê çêkirîya û kirîya devê mirov de, da ku xwe pê bènîne ser ziman, ji ber vê yekê xweşikatiya zimên di xweşikkirina wê de tê ser ziman. Mirov ji, ya ku dikeve ser mil û pişte wê de, ew wê ku mirov vê yekê rast bibîne û li gor wê rastiye nêzîkatiyê bike û tevbigerihê. ..". Her weha bi navê wî tènîne ser ziman.

Lê her weha deme ku li ser navê wî tènîne ser ziman, pê re, tiştêkî din ji tènîne ser ziman. Ew ji her weha, li ser xweşik axiftina alim û zaneyên di nav xalkê de ya. Ew li ser wê yekê ji disekinê. Biqasî ku mirov ji vegotin û gotinên ji wî heta roje me hatina vegotin, mirov ji wan fahm dike ku di deme wî de hinek alimên ku di qada olî de mazin û navê wan heya ji, gotina ku "li dinyê mirov divê li xweşikatiyê û xweşikbûnê ne gerihê". Ew ji, deme ku wê ev gotin diçina guhê wî di pîrsê ku ka "çima" û ji wan bersiva xwe dixwezê û bi vê yekê, êdî dikeve nîqaş û axiftinê de bi wan re.

Êlî Herîrî, bi vê yekê, her weha hinekî ji mazin bi zimên û axiftina wî xweş re navê heya. Bi "maqama" wî ye xweş re navê wî heya. Bi vê yekê re bahsa wî tê kirin. Li ser wî tê sekinandin. Bahsa wî tê kirin. Deme ku bahsa wî tê kirin ji, her weha hinek alim dibêjin, "deme ku di peyivtî, xweşik weke Êlî Herîrî bi peyive". Her weha hinek gotin ji weke ku gotinên xalkê di nav xalkê de mana û heta roje me hatina.

Li gor Êlî herîrî, zimanê mirov rastiyeke mirov bixwe ji ya. Ew wilo ji dibîne. Lê ev yekê di qada şaxsiyetê de tene ser ziman. Li gor wî, ziman bihzir re bitêgihîştin, heya. Ew di bêje yên ku xweşik hizir in karin zimên çêkin. Mirov, karê wê gotina hizir ye ku me di hevoke berî vê hevokê de hanî ser ziman bi gotine *felsefê* ji bixwêne. Ku wilo hat xwandin, wê hingê, rastiya têgihîştine wê gotinê bêne ser ziman.

Di hinek axiftinê ku heta roje me de bigotin heta ji, weha ji tê gotin. "Ziman, makaka, di wê makê de gelek nirxên ji demên berê hene. Mirov, zimên divêt ku weke *nîmetekê* bibîne û bêne ser ziman. Ji ber ku wisa ya. Gotine nîmetê, her weha di vir de, di wate têgihîştinê û pêşketine ku di dîrokê de bûya têne ser ziman. Ew zimên, pir baş têne ser ziman.

Lê li derne, mirov biqasî ku fahm dike ji, wî hinekî ziman bi nirx pîroz hanîya ser ziman. Gotinaka li ser navê wî di nav xalkê de bi teybetî ji li herême botanê ku tê ser ziman weha ya. Mirov divêt ku ziman fahm bike, Ma deme ku Birehîm Xelîl bixwûdê re axift, mana bizimên bû?" Her weha pê re ji wî tê ser ziman. Ziman, hebûna têkiliyê ya. Li gor wî, her beşer zimanê wê yê teybet heya.

Li dergaha xwe, di deme bavê xwe de, çawa ku bavê wî axiftin dikir, wî ew axiftina bavê xwe di serê xwe de jiber dikir. Bavê wî, de ne, mirovekî ku pir xweşik diaxift bû. Bi zanebûn diaxift. Ku mirov bi têgihîştinekê mazin bû, wê hingê ziman bi mirov re di deme axiftinê de xweşik werêne ser ziman.

Li gor Êlî Herîrî zimanê têgihîştinê ji heya. Mirov divêt ku wê ji bibîne û fahm bike. Lê zimanê têgihîştinê, mirov di rastiyê de kur û dûr dibê. Kengî mirov di têgihîştinê de kur û dûr çû ji, mirov wê hingê, bifahm bê. Bi fahm bûn, bi serê xwe nabê. Bi gotinên wê re dibe. Gotinên wê ji li gor wî zimanê wê ya.

Ziman, qancî û neqancîya mirov ji dide rû. Herweha ev yek ji, bi wî re tê ser ziman. Zimanê qancan qanc a. Zimanê neqancan ji ne qanc a. Lê ew di vir de hinek pirsne ji dike û dipirsê ku "gelo zimanê qancan neqanc dibe û zimanê neqancan qanc dibe". Ew deme ku wilo dipirsê, di hizirê û dihizirandina xwe de kur û dûr diçê û mazin diçê. Ew vê yekê jizanebûnê dizane. Li gor wî zanebûn û bifahm bûn, wê vê yekê derxe holê. Wekî din ji, wê mirov vê xalê de bi têgihîştin bike. Mirov ku bitêgihîştin bû ji, wê hingê, wê yekê fahm bike. Fahmkirin, ne bêtêgihîştin a. Ew wilo vê yekê têne ser ziman. Ji vê yekê, di vir de, divêt ku em hinekî girîngiyê digotinê de bidina bêjeyên weke "bifahmbûn" û "bizanebûn" e. Ji ber ku ew divir de girîngiyê didiyê de. Ku mirov di vir de girîngî dayê de, mirov wê hingê, bigihê rastiyê di serê xwe de di jiyanê de. Ew bêje têgihîştinê, di vir de pir bi bûjen û li berçav dibîne. Bi vê yekê re ew pir mazin li ser têgihîştinê di sekinê. Bêja têgihîştinê, di felsefê wî de bi wate mazin a. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman.

Li dergaha xwe, piştî ku ew hatibû dewsa bavê xwe, êdî piştî ne bi gelekî re bi wê pêşketine mazin ye ku di xwe de çêdike, divêt

perwerdekar. Ew êdî li dewsa bavê xwe êw karê ji di hildê ser milê xwe di wê heyemê de.

Êlî Herîrî, deme ku mirov li ser hizre wî û di riya têgihîştina wî de dihizirê, mirov têgihîştinaka mazin ye bizanebûn dibîne. Mirov karê vê yekê bi teybetî bêne ser ziman. Êlî Herîrî di dergaha xwe de, di riya têgihîştina xwe de mirov perwerde dike. Hê ku di deme ciwaniya xwe de bidest vê yekê dike. Ew her weha mirovekî ku pir bizane û pêşketî bû. Wî pir hizir ji bavê xwe û ji pêşketine wî girtibû. Piştî ku ew hatibû dewsa wî, êdî piştîre wî ew pêşketine xwe dabû nîşandin.

Piştî ku bavê wî çûbû ser dilovaniya xwe, êdî demeke ku ew wê jê re bê pêşeng li bendî wî dibe. Piştîre ew mazin dibe. Piştî ku ew heta dewsa bavê xwe, êdî di deme kin de tê nas kirin. Navê wî li her herêmên kurdistanê û ji wê zêdetir ji li gelek herêmên din yê herêmê tê bihîstin. Ew, di deme pêşketin xwe de, hê ku ciwane ji, di riya bavê xwe de dimeşê. Ew Piştî ku hinekî li dewsa bavê xwe dirûnihê, piştîre êdî dike ku her Cizîre bota ew hizir dikeve serê wî de. Ew hizir di serê wî de mazin dibe.

Lê ew di wê heyemê de, wilo zûka ji wir naçê. Ew piştî ku bavê wî diçê ser dilovaniya xwe, piştîre êdî ew li herêmê weke şêxê mazin yê dergahê tê nas kirin û mazin dibe. Ew wilo êdî mazin dibe. Li herêmê wilo ew êdî tê naskirin.

Di deme bavê wî de, çendî ku mirov dihatina cem wî her weha êdî di deme wî de ji wilo mirov hatina wan berdeham dikin. Êdî ew wilo ew tê nas kirin. Êdî li herêmê bi navê Êlî Herîrî û an ji weke ku di nav xalkê de dihata binavkirin *Şêx Êlî Herîrî* bû. Ew wilo dihata naskirin û binav kirin. Êlî herîrî pir evinadarî xwandinê bû. Weke ku di nav xalkê de dihata gotin pir *pir eşqî xwandin bû*. Wilo ew dihata naskirin.

Êlî Herîrî, piştîre ne bi gelekî re êdî ew di nav xalkê de bi navê şêx Êlî herîrî mazin dibe. Ew, piştî ku hatibû dewsa bavê xwe, êdî di pêşketine xwe de hinekî di mazin mazin bûbû. Ew di axiftin û hanîna xwe ya li ser ziman de di nav xalkê de derdikeve pêş. Zimanê wî derdikeve pêş. Ew êdî wilo mazin dibe. Ew weke ku di nav xalkê de dihata ser ziman, "cihê bavê xwe vala nahêle". Ew tiştê ku jê tê xwestin bi têgihîştin be û na ji bi kirin be dike.

Ew ku demekê wilo li dergahê di buhurêne. Êdî piştîre dikeve serê wî de ku herê Cizîre bota û li wir ji demekê bimêne. Ji xwe, yekî ku zanist ba û mazin ba, ne mumkun bû ku wî xwe ne gihandiba wir û ewder ne dîtiba. Her weha zanist, bi evindarê çûna wir bûn.

Êlî Herîrî ji her weha ew aliyê wî hebû. Êlî Herîrî di deme ciwaniya xwe de hê ku bavê wî li jiyane bû, wî hizir dikir ku herê wir û li wir demek maba piştê vegerehe ba mal. Ew ji xwe, weke mirovekî ku zane dihata ser ziman. Weke mirovekî ku bifahm û jîr dihata ser ziman. Bi vê yekê êdî bahsa çûna wî dihata kirin. Hê ku ew ji nû diketa deme ciwaniya xwe de ji yên ku li cem şêx dihanîn ser ziman ku ew herê Cizîre bota hebûn. Yên ku ji xwandin û fahmkirinê ve jîr ban, bala mirov ji dikişandin. Êdî ku ku wilo bal dikişandin ji, êdî di xwandin û berdewam kirinê de dewam kirin dihate xwestin. Deme ku li Êlî Herîrî dihate meyîzandin, êdî wilo ev yek jê dihate xwestin. Wî ji ev yek ji xwe dixwest. Wî dixwest ku berdewam bikira. Ew di xwandinê de pir mazin bixwestak bû. Ev yek deme ku lê ji dihate meyîzandin dihate dîtin.

Lê piştî ku bavê çûbû ser dilovaniya xwe, êdî ew li wir mal mabû û piştê hê ku ciwan bû ketibû dewsa bavê xwe de di wê heyemê de. Bi vê yekê ji, êdî wî wilo berdewam kiribû. Lê di wê deme ku li dewsa wî rûnişt de ji, pir mazin di xwe de pêşketineke mazin da çêkirin. Di wê demê de hê ku ciwan bû, di cihê xwe de ku rûniştî, bidest nivîsandinê ji kiribû. Nivîsên wî ji hebûn. Di nivîsên wî de, maqamet pir mazin derdiketa pêş. Maqamet, weke xalaka girîng ye nivîsandina wî ya. Ew di deme ku diaxift de digot ku "deme ku mirov axift û gotin got, divêt ku mirov wate wê gotina baş zanibe". Wê çaxê, mirov wê zanibe ku mirov çê hanîya ser ziman ji. Mirovê ku zanî ku çî hanî ser ziman, li gor wî, yê ku pir mazin bi têgihîştin bû. Wî wilo di dît. Di hinek axiftinên xwe de ji ev yek dihanî ser ziman.

Wî bizanebûn axiftin, ji xosletekî zanebûnê dihasiband. Her weha ji dihanî ser ziman. Bavê wî ji wilo dihanî ser ziman.

Piştî ku Êlî Herîrî, weke demekê ku li dewsa bavê xwe dimêne, piştê dike ku bi keve riyê de û herê Cizîre bota. Ew ji wê yekê re pir mazin bixwestek e. Wê yekê, di deme ku diaxivê de, car bi car dihêne ser ziman ji. Li ber çûna Cizîre bota ti kesek ne disekinê. Yekî ku çûba Cizîre bota, hingê, bizanebûn ji dihate hasibandin. Wilo lê dihata meyîzandin. Navê wî, bi zanebûne wî re dihat ser ziman.

Li Cizîre bota, her timî û dayimî, mirovên ku zane hebûn. Ji gelek dev û deveran, mirovên ku dihatina wir hebûn. Yên ku navê dayimî di nav xalkê de dihate ser ziman hebûn.

Ne tenê ji herêmên kurdistanê, her timê zanistên kurd di xwestin ku xwe bigihênine wir. Ji herêmê ji zanistên ku hebûn û hinekî mazin dikirin ku carekê ji ba xwe bigihandan wir. Ew der, dereke ku pir bi qadr û

qiymet bû. Jê re aliyê pêşketinê ve wilo dihate ser ziman. Di deme musulmantiyê de, Cizîre bota bêhtir bi nirx dihate ser ziman. Bêhtir navê dihat ser ziman. Ji ber ku nirxekî mazin yê weke Nebî Nuh li wir bû. Ew tirba wî ya li wir, weke cihekî ku di jiyana xwe de carekê ji ba, her musulmanî xwe gihandiba yê de û dîtiba. Her weha dihate dîtin. Cizîre bota warê Nebî Nuh bû.

Pêre ji, mirov divêt ku biteybetî bêne ser ziman ku navê Rihayê ji hebû. Ew ji, weke *mala birehîm Xelîl* dihate dîtin. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman. Bi vê yekê re, êdî Şam ji derketibû pêş. Şam, cihekî ku nêzî herême Rihayê bû. Kî dihat şamê nêzî welatê kurdan ji dibû. Welatê kurdan sînore wê digiha berwaderan.

Li herêmê, piştî ku musulmantî derket, êdî kurdistanê hinekî dî qadr û qiymetê wê mazin dibe. Bi navê Birehîm Xelîl û Nebî Nuh. Ev herdu Nirx li kurdistanê bûn. Çawa ku piştî Çûne ser dilovaniya xwe ye pêxemberê mazin êdî hac bû û ferz bû, êdî her weha li kurdistanê, evder ji mazin her weha derketibûbûna pêş. Li Kurdistanê, pêşketin û têgihîştina ku dihate holê, pêşketine musulmantiyê ye wê demê pir mazin da kifşkirin. Di deme Pêxemberê mazin de Mirovên weke *weysel qaranî* derketin. Wan, di deme xwe de musulmanti pir mazin jîn kir. Ew yên ku pêşî jîn kiribûn bûn. Bi vê yekê navê wan hebû. Weysel qaranî, li Sêrtê bû. Ew piştî ku diçê ser dilovaniya xwe ji, êdî li wir tirba wî dibe weke cihekî zîyeretê. Her mirovên ku bawermend yên herêmê diçina wir û wî zîyeret dikin.

Bi vê yekê, mirov karê bêje ku rewşe pir mazin hebû. Hizir û têgihîştine pîroziyê li kurdistanê, temenê wê li wanderan û li dergahan pir mazin hebû. Li Kurdistanê, dergah, cihna ku mirov pir mazin li ser wan bisekinê ne. Divêt ku mriwo wan hinekî mazin bêne ser ziman. Têgihîştin û têgihîştine srweriyê ye civakê bi hizre olî li wanderan dihate parastin. Li wanderan bicih bû. Lê dergah, cihna sereke bûn. Pêşeng bûn. Ji aliyê olî ve her weha pêşeng bûn. Mîr bixwe ji, ku tiştê kiriba û biryaraka şer û an ji biryaraka di wê astê de bida, li dergahan bi şêx ji dişewirî. Hizre wî ji dihilda û piştî ya ku wê bikira dikir.

Dergah pir mazin li pêş bû. Gotina şêx pir girîng bû. Weke gotinaka pîroz bû. Di nav xalkê de ku çî li ser bihate nîqaşkirin, di nav xalk de û di jiyana de wê şêx û gotina wî ne hatana nîqaşkirin. Her weha ev yek pir girîng bû. Pir girîngî jê re hebû. Bawerî bi gotina şêx pir mazin hebû. Ku wî çî bigota, wê weke gotina wî bihate kirin.

Li Dergahê, piştî ku Êlî Herîrî rûniştibû, her weha gotina wî ji mazin bû bû. Li herêmê navê wî hebû. Hate ku digihişt Cizîre bota ji navê wî hebû. Ew êdî mirovekî ku mazin bû. Wî rastî dihanî ser ziman. Wî têgihîştin dihanî ser ziman. Di dergaha wî de bi sadan zaro û ciwan yên ku perwerde di dîtin hebûn. Gotina şêx di perwerdekirinê de cih digirt, deme ku wî gotin dihanî ser ziman, wê gotina wî di deme perwerde kirinê de ji bihate ser ziman. Wî bahsa wê bihate kirin. Wê li ser wê bihate sekinandin. "Têgihîştine şêx pîroz bû." Gotinên ku ji devê wî derdiketin ji gotinên ku pîroz bûn. Gotinên ku bihatan bicih bûn. Her weha lê dihate meyîzandin. Şêx, her weha mazin bû. Êlî Herîrî, ji ciwaniya xwe pêde wilo mazin dibe. Hate ku ew deme balixbûna xwe bidawi dike, wilo mazin dibe. Piştê, êdî ew weke şêx dihate naskirin û pêşwazî kirin.

Li Şamzînanê di wê heyemê de Mîr Yusif hebû. Ew mîrê wir bû. Yusif, mirove ku pir bizane bû. Ew di wê heyemê de li qasra xwe dima. Li qasra wî ji li ber wî ku bi hezaran mêr û mêrxas hebûn. Ew ji mirovna ku ji mêreniya wan ti gotin ne dihate gotin bûn. Ew di wê heyemê de, ku Mîr çî bigota wan, wê wan ew di cih de bicih bihanîyan.

Di wê heyemê de Mîr Yusif, her timî bala wî li dergahê bû. Li dergahê ji di wê heyemê de Êlî Herîrî rûniştî bû. Êlî Herîrî, bi zanebûna xwe rê şanî mirov û dora dide. Her demî ku dibû roj li dergahê lev gihîne hevdû hebû. Ji ber ku ji demên sibehê pêde xwandin û fêrdayna zarokan dest pê dikir, êdî ew dem pir bi deng û meng bûn. Her hesek li wan digiha hevdû. Mîr ji car bi car diçû wir û li wir li civate li dora şêx lev digiha hevdû lê dirûnişt. Ku her weha levrûniştin çêdibû, êdî bi hev re danûstandinaka mazin dibû.

Mîr Yusif, mirovekî ku bizwne bû. Wî ciwaniya xwe li wir buhurandibû. Mirov karê vê yekê weha bêne ser ziman. Wî ji destpêkê xwandina xwe li wir xwandibû. Piştê ew çûbû bû Cizîre bota û li wir wî xwandina xwe berdewam kiribû. Di wê deme ku ew li wir mabû de ji, mîrê bota lê xwedî derketibû. Mîrê bota, ji xwe deme ku ew çûbû bû wir, hingî ew bi bavê xwe re çûbû bû wir û li wir ew radestê qasra mîr kiribû û piştê vegerehe bû. Êdî ku bavê wî vegerehe bû malê, êdî piştê ew li wir mabû û wî li wir xwandina xwe berdewam kiribû.

Piştê ku ew demekê li wir dimêne û li wir demeke xwe ye xwandinê ku pir bi zanebûnê di buhurêne, piştê ew di vegerihê Şamzînanê û piştê ji ew li wir ku bavê diçû ser dilovaniya xwe, êdî ew dibe mîr li dewsa wî. Ew bûbû bû mîrekî ku pir bizane bû. Zanebûna wî pir mazin bû. Her weha mirov karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Nahaka vêca ew li dergahê li dîwana Êlî Herîrî rûniştî bû û bi hev re didan û standin. Her weha mirov divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Êlî Herîrî, di wê heyemê de ew şêxê ciwan bû. Lê di wê deme ku ew li cihê bavê xwe rûniştibû ji, zanebûnaka pir mazin di xwe de dabû bû çêkirin. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman.

Di wê heyemê de deme ku diaxiftin, wî ji gotina xwe pir xweşik û bizane digot. Deme ku diaxift ji, ku mîr ji dinav de herkesekî lê pir mazin dihisand. Gotina wî di serê xwe de digirtin. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Êlî herîrî, di wê heyemê de di deme ku axiftin di naqabîna wa de çêdibe, her weha êdî ku bahsa cizirî tê kirin û bahsa wê zanebûna wê û lê levcivîna w tê kirin, êdî ew ji di wê heyemê de di serê xwe de hinekî bihizir diçê. Heya wî di wê heyemê de di serê wî de diçê ser Cizîre bota. Ku bahsa Cizîre bota tê kirin, ew ji hinekî di serê xwe de dibe û têne. Di serê xwe de bizîn dike. Hinekî weha li ser wî dihizirê. Ku dihizirê ji, di wê heyemê de dihizirê. Ji gotinên ku têne holê, ew di serê xwe de dike ku wêneyekî biafirîne li berçavên xwe di wê heyemê de. Her weha ew hinekî êdî bi vê yekê weke ku di xwe de diçê. Lê ew çûna wî wilo zêde berdewam nekê. Ji ber ku ew şêx e, û wilqasî bêdengiye wî bala mirovan dikişanda ser xwe di wê heyemê de. Ji xwe şêx her timî di bin balan de bû. Êlî herîrî ji di bin balan de bû. Bala herkesekê li wir li ser wî bû. Bala Mîr bixwe ji li ser wî bû. Lê dimeyîzandin. Deme ku lê dimeyîzandin ji, di dîtîna ku wa ew di xwe de weke ku çûya. Ew yek ji rewş û ji nerîne lê dihata fahm kirin.

Êlî herîrî, di wê heyemê de weke demekê di serê xwe de dihizirê û dibe û têne. Deme ku wilo di serê xwe de dibe û têne ji, her weha weke ku ji xwe lê hatibû. Wilo ew rewş bi wî re weke demekê berdewam dike. Lê wilo zêde berdewam nekê. Hinekî dî ku dem têve diçê, êdî ew ji tê xwe û li dora xwe dimeyîzenê. Deme ku dimeyîzendê, dibîne ku wa hê mirovên li dora wî diaxivin. Ew axiftin, di wê heyemê de hinekî berdewam dike. Li aliyê din ji dengê zarokan ji hinekî ji dûr wan dihat ku dixwandin. Dengê zarokan dihate wan. Wan hisa wan dikir. Lê ew ji di nav xwe de diaxiftin. Yên ku di wê heyemê de di nav zarokan de bi wan ve diçûn û dihatin ji hebûn. Wan ji, fêr didana wan. Dikirin ku ew bixwênin û fêrên xwe hildin. Piştî ku fêrdayin dibû, demeke dî ji ye xwandinê dibû. Ew dem ji, deme revakirinê bû. Di wê heyemê de ev yek hinekî girîng ji bû. Piştî ku revakirin li ser wê fêre rojene dihate kirin, êdî

wê li fêre roje din bihate ve gerandin û wê ew hewl bihate dayîn ku bihate revakirin.

Ev yek, her weha di fêrbûnê de metodaka pir girîng bû. Ji bo ku baş fêrbûn bihate kirin, ev metod dihate bi kar hanîn. Bi vê yekê, derketa holê ku ka kî ji bêhtir jîr e û karê zû reva bike û pêde herê. ..

Êlî Herîrî, di wê heyemê de di deme ku axiftin di naqabîna wa de çêbû bû û ku li ser zanebûnê hatibû axiftin ji, wî ji hizre xwe hanîbû ser ziman û bahsa têgihîştine ji deme biçûkatiyê hate ku mirov mazin dibe kiribû. Li ser wê hinekî dirêj ji sekinî bû. Deme ku ew axiftibû ji, balaka mazin hatibû ser wî di wê heyemê de.

Di wê heyemê de li herêmê gelek bûyar ji rû didan. Li ser wan ji dihata axiftin. Bahsa demê û bûyerên ku dibûn ji dihate kirin. Li ser wan ji yên ku xwedî zanebûn bûn hizre xwe dihanîn ser ziman û yên ku li dora wan ji bûn, bi bal li wan dihisandin. Mîr ji, di wê heyemê de di deme ku bahsa herêmê û bûyarên ku bûbûn hatibû kirin, li ser wê zanîna xwe hanî bû ser ziman. Lê ew deme ku axiftibû ji, wî hizre xwe li ser herêmên kurdistanê başûr û rojhilat hanîbû ser ziman. Piştî hêrîşên saçûqiyay yên ku wan herême ku bi ser ve demeke dirên buhurtibû, piştêrê edî hin bi hin weke ku hatina li xwe dibû. Lê hê ji hêrîşên ku dibûn hebûn.

Ew hêrîş ji deme ku dibûn deng divedan. Li herême, jiyana xalkê pir di asayiya xwe de dimeşî. Jiyana ku pir rûniştî û bi nîrx û pêkên xwe hebû. Bi wê yekê, edî wilo zêde pê bi rê ve çûyin hebû. Lê deme ku li herêmekê hêrîş dibûn, edî li herêmên din zû dihate bihîstin. Bi teybetî ji deme ku tiştêk dibû, edî ne mumkun bû ku di deme kin de ku herêmên di hatana bihîstin û li civatên wan ne bûba mijar û ew li ser ne axiftiban. ..

Piştî ku ew digihina Cizîre bota û mîr tê û wan pêşqazî dike û dibe qasrê, êdî piştî gelek mirovên ku tene wir ku werin û wî bibîne bidest herikîna wir ye qasrê dikan. De ne, navê Êlî Herîrî, pir mazin li herêmê bi şêxîti û qudretên ku bi aqilê xwe re dabûn nîşandin derketibû. Bi vê yekê ew weke şêxekî mazin dihate naskirin û navê wî hebû. Li Cizîre bota ji ew pir mazin dihate nas kirin. Navê wî hebû. Ew di deme xwe de pir caran hatibû Cizîre bota û li alimên li wir û li qasra Mîrê bota bûbû mêhwan. Her weha divêt ku mirovê yekê bi teybet bêne ser ziman. Vêca nahaka kurê wî mirovê ku wilo dihata naskirin û navê wî mazin hatibû nas kirin, hatibû wir. Ji ber vê yekê ji ba, wê mirovan ew meraqa xwe ye dîtina wî wê buhurandiban. Li Cizîre bota ji Kevneşopîya Dergahtiyê pir mazin hebû. Li wir ji, şêxê wir, yê ku xwedî dergah û pir mazin dihate dîtin bû. Yekî ku pir pîroz ji dihate dîtin. Ev yek û wilo hê maztir dîtin, gelej sedemên wê hebûn. Yê ku li Cizîre bota Şêx ba, weke ku nimînêrê nîrx û kevneşopîyên li wir ji dihate dîtin. Ji ber vê yekê êdî mazin li ser wî dihate sekinandin. Navê wî hebû. Ma nîrx ji Nebî Nuh maztir hebû li Cizîre bota? Na, ti nîrx ji wî û navê wî bixwe ji maztir ne bû. Ew tirba wî li wir bû. Hinek kevneşopîyên ku ji deme Nebî Nuh ve dest pê kiribûn û heta wî demê di nav xalkî de bi rêz û pêk hebûna xwe dabûn berdewam kirin. Şêx Ew ji di xwe de di dergaha xwe de binav dikir û pê xwe dihanî ser ziman. Her weha êdî ew yê herî nîrxdar bû. ..

Li Cizîre bota Ne mizgeft û ne ji dergaha şêxê wir ji tirba Nebî Nuh dîr bû. Nêzîkî wî hatibûbûna çêkirin. Ji xwe piştî mizgeft di rex tirba wî de hatibû çêkirin. Piştî hêna mizgeftê ku tirba wî ji dikira nava xwe hatibûn çê kirin, êdî ew mizgeft bûbû "Mizgefte Nebî Nuh". Mizgefte Nebî Nuh, lê pir sofî û mirîd diman. Li wir, li mizgeftê gelek beş hatibûn çêkirin. Beşên ku tede wê zikr bihate kirin cuda bû. Ye ku lê zarok digihîştina hevdu û dixwandin cuda hebû. Ew jibi teybet hatibûbûna çêkirin. ..

Li Cizîre bota, tirba Nebî Nuh, berî hingê li ber Ava Diclê hatibû çêkirin. Lê piştî di demê ava diclê weke ku hinekî ji ber tirbê vekîşaha bû. Hinekî kêmbûbû. Lê hinek navbend ketibû naqabîna avherikîne û tirbê bixwe de. Lê hê ji ew wilo ne dîrî hevdu bûn. Ew Diclê bi xuraxuraka mazin ku jê dihat diharikî û diçû. Nalînaka mazin ji nava wê dihat.

Ku mirov li avê li beravê li avê dihisand, weke ku gelek deng jê di nav hev de werine mirov li mirov dihat. Her weha mirov karê wê bêne ser ziman. Xuraraka mazin jê dihat. Ku mirov dihate ber wê ji, hinîkayiyaka mazin mirov digirt û dilê mirov xweş dikir. Mîrê bota hij kêfa xwe dikir. Her dayimî wî li ber diclê civata xwe li dar dixist. Mirovên ku nêçîrvanê kewan ji bûn, dihatin û li wir hinekî ji wir wir de diçûna nêçîre kewan. Nêçîre kewan, li Cizîre bota pir mazin bi nav û deng bû. Kedîkirin û xwedîkirina wan ji wilo bi heman awayî bi nav û deng bû. Mirovên ku ji wî karî fahm dikirin hebûn. Yên ku bi teybetî bi kewan ve mijul dibûn hebûn. Ew kewên "qaqaba" ku mirov guneh dikir ku li wan meyîzenê, ku ew dihatina girtin û dihanîna ber mîr, êdî mr pir kêfa wî xweş dibû.

Di wê heyemê de li qasra mîr ku wî li cem xwe digirtin ji, gelek kewên wî hebûn. Mirovna ku biteybet bi wan re mijul ji dibûn hebûn. Ew mirov ji, mirovna ku pir baş ji xwedîkirin û kedîkirina wan fahm dikirin bûn.

Mîrê bota, di qasra xwe de cihekî mazin ji rûniştina xwe re vaqatandibû. Dideme ku dixwest ku bitenê bimene diçû wir. Lê ew her timî bi mirovên li dora xwe re bû. Ew bitenê ne dima. Wî ewder, weke pirtûkxanayekê ava kiribû. Bisadana pirtûk û nivîsên zanistên deman têde hebûn. Gelek zanist, pirtûkên wan têde hebûn. Li Cizîre bota, qadrekî mazin ji zanistitiyê re hebû. Mîrê bota, mîrê Cizîre bota bû, ma dibû ku wî xwe ji wê kevneşopîyê û hêjadayîne dûr kiriba? Ne, nedibû. Li qasra wî, weke her demên berê, pirtûkxaneyeka pir mazin hebû. ..

Piştire ku Êlî Herîrî û yên ku pêre ku ghiştina wi rû ji aliyê mîrê bota ji hatina pêşwazî kirin, piştire bihev re çûbû bûna qasrê û li qasrê li hevdû rûniştibûbûn li hevdû û bi hevdû re diaxiftin. Di deme ku bahsa navê Êlî Herîrî hatibû kirin, êdî yên ku alim bûn û sofî û mirîd bûn, dem winda ne kiribûn û di cih de hatibûbûna wir û li wan rûniştibûn. Êlî Herîrî, di wê heyemê de li Cizîre bota bû. Ew ji riyaka pir dûr hatibû. Wî, bi yên pêre re ji, deme ku ketibûbûna rê de wan riya xwe bi gelek deran xistibûn. Her dera ku çûbûnê de ji rastî eleqeyeke mazin û rêzeke mazin hatibûn. De ne, şêx, her timî li Kurdistanê bi kevneşopî bû. Navê wî heya. Kevneşopîya wî ye bi hezar salan heya. Ew bi kevneşopî û nirx a. Bi vê yekê re her weha divêt ku mirov wî bêne ser ziman. .. Êlî Herîrî ji, deme ku wan riya xwe bi derne din ji xistibû û çûbûbûna wanderan ji, li wanderên ku çûbûbûnê de ji, li wanderan rastî eleqeyeke mazin hatibûn. Li wanderan ji, pir baş û mazin hatibûbûn pêşwazî kirin. Bi rêzeke mazin hatibûbûna azimandin. Lê her dere ku hatibûbûnê de ji,

wilo zêde lê nemabûn. Ji ber ku xwe bigihênine Cizîre bota lez dikirin. Ji bo ku riya wan dirêj nebe û di rê de tiştin newin serê wan ji lez dikirin. Her herême ku çûbûnê de û piştîre jê ketibûbûna rê de ji, ji wir ji yên ku bi wan re heta cihê din yê ku wî çûbanê de hatibûn hebûn. Ew her weha bi tenê ne hatibûn hiştin. Bi vê yekê, wan pir bi awlayî rêwîtiya xwe derbas kiribûn.

Di rê de, berî ku werin û bigihine Cizîre bota, wan xwe gihandibû Serdêfê ji. Li wir ji, demekê mabûn û piştîre ketibûbûna ser riya xwe de û êdî riya xwe berdeyam kiribûn.

Li serdêfê, weke demekê li wir dimênin. Li wir dergaha şêxitiyê ye pir kevn hebû. Ew der, devereke ku pir kifşkar bû. Di demne de ku biryar hatina standin, ew der ji bûya xwediyê hizir li ser biryaran. Mîrê bota bixwe ji bi wê mazinatiya xwe ve çûya wir û li wir dergahê rûniştîya. Her weha mirov divêt ku vê yekê biteybet bêne ser ziman. ..

Lê Êlî Herîrî û yên ku pêre ne, wilo zêde li wir namênin. Piştîre riya xwe berdeyam dikin û têne bi ber Cizîre bota de. Ku têne ber Cizîre bota lê ku hê ne ketina navendê re, li dora wê rastî gelek *koz* û *konên* koçarên ku ji herêmên kurdistanê yên weke Sêrt, wan, mûşê û hwd, bi sawalên xwe re hatina wir ji, ew rastî wan tên. Li derne wilo ji di sekinî û bêhne xwe divekin. Lê wilo zêde nemênin. Piştîre riya xwe berdeyam dikin. Dora Cizîre bota, her sal di demên demsalê de pir mazin bi çûn û hatin bû. Pir qalabalix dibû. Ji gelek der û deveran dihatina wanderan û bicih dibûn. Lê ku demsal di buhurt, êdî ew ji divegerehene herêmên xwe malên xwe di wê heyemê de. Ku sal careka din zîvirî û hat, êdî ew ji careka din dise dihatin. Wilo jiyana wan berdeyam dikir. Lê her ku dihatin û vegerehen ji, hinekî dî dewlemendtir di vegerehene malên xwe di wê heyemê de.

Koçerî, divêt ku mirov di vir de çend gotinan li ser bêne ser ziman û bêje. Ji ber ku ev yek pir girîng e. Koçertî, jiyana wê, di kurdistanê de bi pergal bû. Ew jiyana wê ye bi pergalbûyî, bi hezar salana wilo hebûna xwe berdeyam kiribû. Bi teybetî ji, mirovên ku pîr zêde dabara xwe bi sawêl dikirin, aliyekî jiyana wan yê koçertiyê ji hebû. ..

Mirovên ku li kurdistanê koçertî dikirin, hema bêja hemûkê wan kurd û kurdistanî bûn. Bi teybetî ji ji herêmê Serhadê waderan, mirovan, ji xwe kon di çêdikirin, û her demsalê berê didana ber çemê Diclê. Divêt ku mirov vê yekê ji bêje ku çemê diclê hemû dibû sedeme wê jiyana koçertiyê bi biafirê. Mirovên ku bi sawêl di çûn û dihatin, dizanîn ku ka sawal li ku derê bê û wê baştir biçêrê. Li duv cihên ku ji çêrandinê baş

çûyin wan bi jiyanka koçrtiyê dihanî heta ber çemî Diclê herêmê botanê. Lê piştire ku demsal dibuhurt, êdî wê careka din sawalên xwe bidina dora xwe û wê vegehrîhîne malên xwe û demsalên xwe baş bi buhurênin. Her weha diwêvê ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. ..

Êlî Herîrî û yên ku pêre, deme ku tene ber Cizîre bota, li wir ku hin koçerna dibînin êdî yên ku wan nas dikin ji rastî wan hine ji wan tên. Piştî ku rastî hevdû tên, êdî piştire li hevdû disekinîn û bi hev re demekê di rûnihin. Sawalên xwe hinekî rehet dikin û av didin û piştire ku ew hinekî bêhne xwe diberdin, êdî dikevîne ser rîya xwe de ku herine navende Cizîre bota. Li dora Cizîre bota, mirovên ku her timî ji bo awlakariyê hebûn ji digeriyan. Ew ji deme ku Êlî Herîrî yên ku pêre dibînin û piştire ku fahm dikin ku ew şêx e û ji dûr hatiya, êdî di cih de xaberê digihênine qasrê mîr û piştire bi wan re tên heta ku tene qasrê. Piştire her weha ku tene êdî mîr wan pêşwazî dike û piştire wan dibe qasrê û li qasrê bicih dike. Di wê heyemê de ji li qasrê bûn û li hevdû rûniştî bûn û bi hev re ku li dora pir mirov hebûn di axiftin.

Di wê heyemê de li qasrê bûn û li evdû rûniştî bûn û bihev re diaxiftin. Mîre bota ji li wir li wan rûniştî û diaxift. Gelek mirovên ku nawserî xwe hebûn. Ew ji li wir li wan rûniştî bûn. Wan ji, ku diketa derba xwe de mafê axiftinê dihildan û diaxiftin. Yên ku li Civate mîrê bota dirûnişt, yên ku karîbûn ku li ber biaxiftan û gotin bigotan bûn.

Êlî Herîrî, di wê heyemê de li Cizîre bota bû. Ew êdî li Cizîre bota bû. Wê êdî hinekî weke demeke dirêj wê li wir maba. Wî li wir bi alim û zanistên wir re maba. Li wir gelek mirovên zane hebûn. Mirovên zane, xwe li wir digirtin. Her timî li wir diman. Her zanistê herême di jiyana xwe de demekê kin ji ba, xwe digihanda Cizîre bota û demekê li wir dima. Her weha mirov karê bê yekê ji bêne ser ziman. Di wê heyemê de ji wan zanistên ku li Cizîre bota bûn ji, gelek ji wan li qasrê li civatê bûn. Li dora mîr û mêhvanên wî bûn. Li ber wan ji hev re diaxiftin. Zanebûna xwe dihanîn ser ziman. Çi bi wan re hebû û di serê wan de hebû dihanîn ser ziman. De ne, li dereke wilo, ne mumkun bû ku mirov bê deng maba. Nexasim vêca ku zanist ba. Mirovên zanist, ku hizrek di serê wî de çêdibe, dixwezê ku wê bêne ser ziman. Ji ber wê ji ku pêdivî ji pê hebe wê tekoşînekê ji bide. Ev xosletekê zanistan a di zanistitiyê de.

Li ber Mîrê bota li Cizîre bota li qasre wî axiftin, navê wê hebû. Piştire di nav xalkê de ji di hate vegotin ku vî mirovî li qasrê li ber mîr di nav civatê de weha axift û hanî ser ziman. Wê wilo li ser navê wî bûba nav û belav bûba.

Di wê heyemê de, piştî Êlî Herîrî û ew hatibûbûna wir, êdî weke demekê ew li wir li hevdû dimênin. Lê ji deme ku hatibûn ve Êlî Herîrî, heta wê demê wilo zêde ne axiftibû. Hê wilo zêde ne axiftibû. Lê bal li ser wî ciwanî hebûn. balna mazin li serwî hebûn. Mirovên li dora wî ji hema bêja hemû ji yên ku jê bi temenê xwe mazitir bûn. Yên ku zanebûna wan mazin hebûn. Vêca ku Êlî Herîrî li ber wan biaxifta wê çi bigota û bihanîya ser ziman? ya rastî ku mirov bêje di wê heyemê de dilperiyak ji pêre hebû. Her weha ew dilperiya wî ji ji aliyê yên li dora wî ve dihate kifşkirin û dîtin.

Di wê heyemê de hem yên ku bi Êlî Herîrî re hatibûn hinek ji wan û hinek mirovên din yên ku li wan rûniştî ji bûn bi hev re ketibûbûna nava axiftinê de. Wan, zanebûna xwe jevre dihanî ser ziman. Weke ku wan xwe di axiftinê de windakiribû li wan hatibû. Her weha dihate ber çavan. Ku ye diaxift û piştî ku axiftina xwe bidawi dikir, êdî yekî din ne dihişt ku dem bikeve navê de û mafê axiftinê digirt û diaxift. Civata wan wilo bû. Lê ti kesekî di berhev de ne diaxift. Herkesekî rêz dida hevdû. Deme ku yek axift, herkesekî lê dihisand û ku wî axiftina xwe bidawi kir û yekî dî ji mafê axiftinê girt û axift, êdî weke ku li wî yê ku axift heta hisandin wê li wî ji bi bêdeng bihata hisandin. Di ber hevdû de gotin di wê rewşê de ne dibû. Li ber mîrê bota ev yek ne dibû. Yê ku diaxift ji, hizre xwe pir baş û qanc dihanî ser ziman û piştî dima sekinî di cihê xwe de û mafê axiftinê dide yê dora xwe di wê heyemê de.

Wê rewşê wilo weke qadarekê biaxiftin û danûstandinê berdewam kir. Piştî ne bi gelekî re mirovekî ku bi temenê xwe pir pîr bû û her timî ji di civate mîr de lê dihate hisandin û ku zanebûna wî ji mazin bû û ku navê wî şêd Xelef bû, di wê heyemê de mafê axiftinê girt û kir ku herkesekê di axitina xwe bimêne sekinî di wê heyemê de. Ew deme ku axift, wî hingê çend gotin gotin û piştî ma sekinî Lê ku ma sekinî, wî kir ku piştî wî re bal herina ser Êlî Herîrî di wê demê de. Êlî Herîrî ji ev yek wilo farq kir. Ji ber vê yekê di wê heyemê de weke ku ji xewê rabê lê hat û hate xwe û piştî wî bi nêzikatiyaka bi ceger mafê axiftinê girt û bidest axiftinê kir. Ji wê kirina Êlî Herîrî herkesek hinek bi heybet ma sekinî. Mirovekî ku hema bêja ji yên li wir li dora wî ji hemûkan biçûktir wilo biceger tevgerê. Bi vê yekê, êdî bala herkesekî çû ser Êlî Herîrî. Êlî herîrî ji di wê heyemê de dît ku wa baê hemû li ser wî na.

Êlî Herîrî, di wê heyemê de mafê axiftinê girt û axift û hinekî bizanebûna xwe li ser aqilatiyê û têgihiştine mirov sekinî. Êlî Herîrî bi gotinna pir xweş û xweşik axift û hanî ser ziman. Yên ku li dorê ji bûn,

bala wan bi teybetî çûbû bû ser awayê axiftina Êlî Herîrî di wê heyemê de. Êlî Herîrî, ew deme ku bû ne axiftibû. Ji deme ku hatibû wir, wilo hê zêde ne axiftibû. Lê wê carê weke ku xwe û zanebûna xwe raxe berçav kiribû û dirêj û xweş û bizanebûn axiftibû.

Êlî Herîrî, deme ku axift, hinekî ji zanebûna xwe axift. Lê demeke dirêj axift. Wilo bi kurmanciyaka xweşik diaxift, weke ku ji dora xwe re helbestan bixwêne li mirovên li dora wî dihat. Bi wê awayê û yekê, Êlî Herîrî demeke dirêje diaxivê ji dora xwe re. Ji gelek qancên xwûdê û pêxemberên ku hatina bahs kiribû. Lê hemû ji ji bo ku hizre xwe ye ku têde li ser zanebûna êqil disekinî bêne ser ziman dihanî ser ziman. Wilo ew weke demeke dirêj diaxivê û piştîre dimêne ser sekinî. Şêd Xelef ma gelo dizanî ku Êlî Herîrî wilo xweşik û pir baş dizanî ku biaxivê. Piştî axiftina Êlî Herîrî, hinek nerîn çûbûbûna ser wî ji û weke ku vê peyemê bidina wî li mirov dihat.

Êlî Herîrî, piştî ku ma sekinî, êdî bal ji ser qut nebûn. Piştî axiftina wî ji herkesek di bin bandûra wê axiftina wî de ma. Êlî Herîrî, biaxiftina xwe bandûrakî mazin li ser mirovên ku dora xwe ku lê rûniştî bûn kiribû. Mîrê bota ji lê biheyran mabû. Ew ji bala wî pir mazin li ser Êlî Herîrî bû. Piştî ku Êlî Herîrî axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî ji, balên ku çûbûbûna ser wî ku ye mîr ji di nav de ji ser wê ne divaqatahan di wê heyemê de. Herkesekê ku li wir, pir bi bal lê dimeyîzend. Herkesek lê û li wê axiftina wî biheyran mabû bû. ...

Êlî Herîrî, piştî ku wî axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî ji, piştîre, weke qadarekê bi bédengî mayî sekinandin bû. Piştîre, ku demek têve diçê, êdî yê ku piştî Êlî Herîrî re ku axift mîr bû. Mîr, berê xwe da Êlî Herîrî û mafê axiftinê hilda û gote Êlî herîrî ku "ti çî xweş û xweşik û bizane axiftî. Rehme xwûdê li bavê te bê" û ma sekinî. Êlî Herîrî, piştî ku mîr wilo ji wî re got û ma sekinî, piştîre hinekî mirovên din ji axiftin û heman gotin gotinê de. Piştîre ku çend mirov axiftin, piştîre yê ku axift û Şêd Xelef bû. Ew ji mirovekî ki pîr bû û pir bizane bû. Ew di wê heyemê de li Mizgefte Nebî Nuh ji dima. Li pêşiya cimaatê ji mêj dikir. Her weha ev yekî ku pir mazin rêz jê re dihate girtin bû.

Piştîre wilo ku hinek dem têve çû, êdî mirovên ku axiftin zêde bûn. Piştîre mirovên din yên ku li wir bûn mafê axiftinê girtin û axiftin. Wan ji hizre xwe bi heyraniya xwe li Êlî Herîrî hanî ser ziman.

Piştîre ji, ku çend mirov axiftibûn bi ser axiftina Êlî Herîrî de, hê jî, bala mirovên ku li dora wî bûn li ser wî bû. Lê dimeyîzend in. Weke ku ne dixwestin ku bala ji ser wî bibin. Her weha rewşek afirî bû. Piştî ku wilo

hinekî axiftin û bi balbûna li Êlî Herîrî bû, piştîre ne bi gelekî re sofre xwarinê ye ku wê li ber wan hatiba vekirin, kara wê hate kirin. Wê civat ku ji cihê xwe ne labitî wê sofre hatiba ber wan. Wê li ber wan hatiba vekirin.

Di wê heyemê de, ne tenê Êlî Herîrî weke Şêx li wir bû. Weke wî şêx Şerîfê gijalî û şêx saidê Cizîrî ji hebû. Şêx Saidê Cizîrî, ku mirov bahsa wê kir, divêt ku mirov hinekî bi rêz bahsa wî bike. Mirovekî ku çîqa bizane û qanc bû. Navê wî ji mazin bû. Ew ji, navê wî li Dora Cizîre û ku heta ku digiha Nisêbînê û hezexê û gelek herêmên din hebû. Navê wî hebû bihîstin. Lê Ew pir kal bûbû. Wilo zêde nikarîbû ku li ser xwe bimeşiyana. Ku hinek ji mirîd û sofîyên wî alî wî ne kirina, wê nikarîba ku bi meşîba. Kopalekî wî yê ku ji dil hatibû çêkirin hebû. Li ser serê wî yê ku di destê wî de bû, navê xwûdê û pêxember hatibû nivîsandin. "Dihate gotin ku wî gotiba bi destûra xwûdê û serê kopalê xwe li ardê xistiba, wê li cihê wî kopalê xwe lêxistî wê av derketiba. Wilo ew bi keremet û mazin dihate ser ziman. Riheke pir sipî û dirêj li ser bû. Kurmanciyaka ku ew pê diaxift, li wir heta wê demê ti kesekî digotin ku ne dikarî ku pê biaxifta. Her weha ev ji ji wê *keremete* wî û ji *ocaxa* wî dihate hasibandin. Ji bo wî dihate gotin ku secere wî wî pir mazin bû. Ew yekî ku pir mazin bû. Zanebûna wî ji pir mazin bû. Ew ji li mizgefte Nebî Nuh dima di wê demê de.

Lê deme ku wî li wir axiftina Êlî Herîrî dîtibû, êdî pir ji sehl û bandûr hildabû. Her weha dihate gotin. Şêx Saîdê Cizîrî, pêşekî wî li herêmê digiha ashabîyê mazin ku jê re dihate gotin "êlîmê rim kesk". êlîmê rim kesk ji, biaslê xwe kurd bû û ji dora Cizîra bota bû. Lê ji Cizîre bota ku mirov hinekî bi ber Aysere û ji wir bi ber Qaraxrabê û Xirabê Sosina ve diçû, mirov digihişt herême wî. Ew, deme ku hin herîşên hovana li herêmê dibin, ew mirîd û sofîyên xwe dide dora xwe û bi wan re ketibû şer de. Ew li cihê ku lê pekrawan dikeve ji wir nayê dûr kirin. Tirba wî, weke ku tê zanîn ji li "*girê êlîm*" e. Lê deme ku ketibû şer de ew pekrawan ketibû. Mirovekî mazin û zane bû û qanc bû. Rehme xwûdê lê bê!

Êlîmî rim kesk biqasî ku tê gotin, wî pêxemberê mazin Hz Muhammed ji dîtibû û pêre mabû. Li herêmê navê wî pir mazin bû. Ew piştî ku pekrawan ket, êdî her sala ku di wê hefteya ku ew têde pekrawan ketiya ku têde bê *zêw* dihata dayîn. Ew ji, li herêmê pişt wî re bi sadsalan berdewam dike û bi navê "*Zêwe êlîm*" dihate ser ziman. Zêwe êlîm ji, i mihe hazîranê de dihate dayîn. ..

Ji vê malê, li herêmê li gelek deveran yên ku dergah vekiribû hebûn. Li Ayserê ji hebû. Banihê, avdika, girêmîra, serkahniyê û hwd dihate gotin ku dergahên ku hatibûn vekirin û xwe digihandina wî hebûn. Lê Dergaha mazin di wê heyemê de li Cizire bota ji ji hebû. Ew ji li wir ji mazin bû. Herêm, mirov karê bêje nêvî bi nêvî pêve girêdayî bû. Her weha mirov vê yekê bi hesanî bêne ser ziman. Êlîmê rim kesk, mirovekî ku zanebû û di beraxa xwe de serê xwe da. Wî, ax û jiyan ji nirxtiyê dihasiband. Ku ne wilo ba, ma wê di ber wê de di deme ku hêrîş hatinê de wê ketiba şer de û di ber de canê xwe daba? Hingî, di deme wî de têgihîştineke mazin ye kurdan di vê yekê xalkê de bi têgihîştina axê re hebû. Ax, li hinek herêmen ji "pîroz" ji bû. Şêx Saîdê Cizîrî, di hin axiftinê de xwe de baweriyê bi axê ji têne. Ew dibêje ku "mirov ji axê ya, nan û sad ji axê ya, rêze jê re ji rûmetê mirov û ji mirov bixwe re ji ya." Her weha li ser navê wî tê ser ziman.

Di wê deme ku Êlî Herîrî axiftibû, hingî, piştê çend mirov axiftibûn ji, êdî ew ji axiftibû û wî ji axiftinaka pir xweş û xweşik kiribû. Lê wî ji heyrantiya xwe ji axiftina Êlî Herîrî kêrî ne kiribû û hanîbû ser ziman.

Divir de, divêt ku mirov weke gotinekê ji bê, hingî, weke astekê bû ku ji şêxan bixwe ji dihate xwestin ku di zanebûna xwe de û di zanebûna di derbarê dîrok û têgihîştinê de ne kêrî bin. Ev yek, weke nirxeke ku ji wan dihate xwestin bû. Ku du şêx dihatina cem hevdu di dîwana de û an ji di hin civatna de, li zanebûna wan ji dihate meyîzandin ku ka çendî bi zane na û kî di zanebûn û têgihîştineka çawa de ya. Her weha lê dihate meyîzandin. Ev yek ji, her weha ji wan giring dihate dîtin. Bi zanebûna xwe re diviyabû ku wî bersive her pirsên ku jê dihatina kirin bida. Ev yek her weha bêgûman dihate xwestin ji şêx û ji zanebûna wî.

Di wê heyemê de li Êlî Herîrî ji dihate meyîzandin ku ka ew çendî bi zane ya. Ew hê ciwan bû. Lê wî, bi wê ciwaniya xwe re ji, zanebûneka mazin dide nîşandin. Ew xwediyê zanebûnaka mazin bû. Lê Êlî Herîrî, divêt ku mirov di herî de car bi car bêne ser ziman ku ew çend xwediyê zimanekî pir xweş û xweşik bû. Ew bi vê xsoleta xwe re derdiketa ser herkesekî re. Her weha mirov karê vê yekê hesanî bêne ser ziman û bêje. ...

Êlî Herîrî, di deme ku di wê heyemê de li ber mîr û mirovên li dora xwe axiftibû hinekî bahsa zanebûna xwe ye di derbarê dîrokê de ji kiribû. Nerîna xwe ye li ser dîrokê di wir de hanîbû ser ziman. Wî dîrok, "weke pêşketineke ku mirov re destpê dike dihanî ser ziman". Her weha pêre ji, ku bahsa rewş û pêşketinên di deman de dihate kirin ji, wî ew weke

”jiyandinên ku jiyîna” dihanî ser ziman. Lê wî giyanak an ji rihek di dîrokê de di dît. Ew ji dihanî ser ziman. Ew ji weha dihanî ser ziman, ”dîroka rast a, mirov bi rastiya demê re rast dibe. Lê dem, divêt ku mirov fahm bike ku çî têe bûya, ew ji girîng e. Lê dem, demên ku li pey hevdu demên ku dem bi dem jîn dibin a.” Weha ji wî tê ser ziman. Lê weha ji tê ser ziman ku ”wî bi hev ve girêdan di rewşan de pir dikir.” ..

” Hizirkirin, mirov di demê de bi têgihîştinê dike. Lê dem bi dem pêşketin û têgihîştine ku hatiya jîn kirin û bûya ji winda nabê. Di mirov de ji dimêne. Ji mirov di buhurê mirov.” Her weha ku hizre wî bahs tê kirin ji wî bahs ji tê kirin. Ev gotin, gotinna ku mirov pir li ser wan bihizirê. Gelek rastiyan tênine ser ziman.

Têgihîştine Êlî Herîrî, pir mazin bû. Têgihîştineke mazin ku bi mirov re bû, hingî, mirov bi felsefe dike. Felsefe ancama wê têgihîştina ku bûya û pêşketiya. ”Zanebûn, mirov ava dike”. Zanebûna ku mirov ava dike, têgihîştine ku pêşketiya û di deman de buhurtiya û bi wê buhurtina xwe re ji pir mazin pêşketiya. Lê xosletekê Êlî Herîrî heya û tê ser ziman u mirov divêt ku wê pir baş fahm bike. Ew ji her weha yek dîtina mêr û jinê ya. Ku bahsa wî dihate kirin, her weha hinek hizir têne ser ziman. ”em û jiyan ne bê mak in, bila rêz û hûrmet ji maka me re hebe.”Berî wî, Weysel qaranî ji jîya bû. Ew ji pir mazin li ser rêz û hûrmete li dayikê sekinî bû. Wî ew yek, ji nirxekî ku hebûna mirov ye pîroz diafirêne dihasiband. Ev nêzîkatî, bi Êlî Herîrî re ji xwe de berçav. Êlî Herîrî ji, wê yekê di hin nêzîkatiyên xwe de derxistina pêş. Ev yek, her weha pir girîng e. Di deme ku bahsa Êlî Herîrî di hate kirin de minaqaka pir balkêş ku bi dayikê ve girdayî ya tê ser ziman. Her weha Ew ji weha ya. ”Tê gotin ku rojekê dayikak ji kurê xwe pir tahdê dibîne. Ew ji rojekê xwe nagirê ji ber wan tahdêyên ku lê dibin û diçe cem Pêxember û derdê xwe jê re têne ser ziman. Lê deme ku ew têne ser ziman pêre digirî ji. Hingî, pêxember ji pêre digirî. Hingî di dawiyê de gotina ku ji devê pêxember derdikeve ew e ku ”yek tahdê li dayika xwe bike wê cihê wî ne bihuşt bê û wê xwûdê ji wî afû neke”.Herweha tê ser ziman.Ev gotin, deme ku tê gotin, weke gotinaka ku her timî di aqilande bê hiştin tê ser ziman. Bi vê yekê, rêz û nirxdariya li ber dayikê her timî weke astaka ku mirov pê bê şîrovekirin tê ser ziman. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku rêz û hûrmeteke mazin ji dayika heya. Ev yek, di kevneşopîye herême de ji biwate heya. Ti kesek nîqaş ji nakê. ..

Êlî Herîrî ji hêjabûnak dide dayikê. Ji ber vê yekê bû ku di ber civatan de jinên nawserî ji dirûniştin û weke mêr bigotin dibûn û dihanîn ser ziman.

Êlî Herîrî, hizre xwe ye dîrokê, bi têngihîştineke ku mirov wê bi demê re fahm bike têne ser ziman. Her weha ew vê yekê girîng ji dibîne. Ew girîngiyekî dide, ku "mirov deme ku tede dijî ji zanibe û fahm bike." Ev gotina wî li ser dîrokê vir de têngihîştine bi yekê re bi me re çêdike. "Dêm her wek xurşîde". Ev gotina wî, hizreke diserê me de çê dike. Ew hizir ji her weha weke ku me li jor hanî ser ziman, bi têngihîştina deman a û ew ji guharîna wê ji bitêngihîştine. Ew wilo ji tê ser ziman. ".. wek xurşîde", bi navkirina rewşne hizrî na. Her weha divêt mirov vê yekê wilo fahmbike. Lê di dereke din ji weha dibêje, "Dêm her wek qqemerî, / Ez t'êr nabim ji munzerê, / .." Buhurtin û çûna demê di vir de bilêv dike. her weha têne ser ziman. Di ber dewama van rêzan de Êlî Herîrî dibêje "Min naçît ji xeyalê". Ku mirov bi awayekî helbesterî lê dihizirê, mirov têngihîştinaka ku bi hizre evînî tê ser ziman lê bidilbûnekê tê ser ziman kifş dike. Lê ev gotin ji aliyên felsefe wî ji bi wate na û ji van aliyan ve ji têngihîştinaka bi hizrê re ku ji têngihîştine deman ne dût e têne ser ziman.

Êlî herîrî, bi têngihîştine wî re gotinak tê ser ziman, ew gotin ji her weha têngihîştine ji felsefe wî dide dest me. Ew ji her weha ya. "Êlî Herîrî bi zanebûna xwe ye ku pêre bû, dizanî ku hemû tişt ji aliyê xwûdayekî ve hatiya xuluqandin. Ew dizanê ku rihê "her tiştê ku siha wê heya rihekî wî ji heya." Deme ku mirov li vê gotinê dihizirê, mirov fahm dike ku hinekî di felsefê de kur û dût çûya. Ew pir bihizir û têngihîştin bûya. Ew ji tiştên ku di serê xwe de bi têngihîştin dizanê, ji wan bêhtir dixwezê ku xwe bigihêne wan. Bi vê yekê, ew xwe dide hizirkirinê û pêde diçê. Ku mirov hinekî li ser vê gotinê dihizirê, mirov karê bêje ku her tiştê bicism û hişke giraniyaka wê heya. Lê ew tişt li gor hebûn û mazinbûna xwe ji laşekî wê ji heya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku her tiştê ku heya û li berçav û tê dîtin, ku tava rojê da aliyekê wê, wê aliyê din wê sihaka wê ji biafirêne. Her weha rohnîya rojê vê yekê diafirêne. Mirov ji siha wê heya û kevir ji. Lê mirov bijn a lê kevir weke tê zanîn ne bijîn a. Lê deme ku mirov li vê gotina ku bi Êlî Herîrî re tê ser ziman, her weha mirov fahm bike, ku di têngihîştine wî de weke ku ew li wê yekê ji xwediyê ramanekê ya. Mirov, ku wê gotina wî bixwêne, wê di serê xwe de bigihê wê qanaate ku rihê kevir ji ew dihizirê ku heya. Mirov ji wê gotinê vê ji derdixe. Lê ka em hinekî li ser vê yekê bihizirin û hizre ku bi têngihîştine Êlî Herîrî re me re çêdibe çawa ya.

Êlî Herîrî, têgihîştine wî ne dûrî xwazayê ya. Ew bixwezayê ji dihizirê û têne ser ziman. Ew giringiyeke xwezayê ji di jiyana mirov de dibîne. Xweza û hewirdor, bi wî re di serê wî de xwediyê cihekî safî ya. Her weha divêt ku mirov vê yekê kifş bike.

Di felsefe Êlî Herîrî de, rastî ji hebûnê ya. Lê têgihîştinaka wî ya ku rastiyan ku wê liberbûnê ne û wê bibin ji heya. Her weha di têgihîştine wî de ev yek ji wilo heya. Bawerî, di vir de li gor wî, kuu mirov wê baş û qanc fahmbike, wê mirov bigihêne wê rastiyan ji. Ew wilo dihizirê û têne ser ziman. Bi vê yekê re, ew têgihîştineke demî têne ser ziman. Lê ew têgihîştine demî ya ku têne ser ziman, di wê têgihîştine de êdî derdikeve dervî deme xwe ji. Derdikeve dervî deman û zamanan. Ew wê yekê bi derfet dibîne. Ku mirov li hizre wî lê di hizirê, mirov wê yekê pêre dibîne. Derketina dervî deman, ew di çerçoveyeke ku mirov xwe nêzî xwûdayê xwe bide de têne ser ziman. Lê di temenê wê hizrê de ew wê têgihîştinê wilo têne ser ziman. Ew di wê têgihîştine ku mirov xwe nêzî xwûdayê xwe bike wê têne ser ziman. Derketina dervî deman û zamana, ew weke "bêdembûn"ê têne ser ziman û her weha "ku mirov ji dinyê çû û çû axîretê, hinegî, mirov wê bigihêne wê. Dem û zaman, li gor wî û têgihîştina wî, weke le birentekê ne. Ew dihizirê ku hingî, mirov wê derkeve dervî wê. .. Bawerîya mirov, mirov di têgihîştina wê de kur dike. Bawerî, her weha çend ku mirov di wê de kur dike ji, wilqasî ji "mirov nêzî rastiyan û rastiya xwûdê" dike. Her weha wê têne ser ziman. Rastiya xwûdê, li gor wî ku mirov tenê li xwe ji bihizirê wê kifş bike. Lê li gor wî divêt ku li gor wî divêt ku bi têgihîştinekê li xwe meyîzenê. Ew têgihîştin ji, her weha têgihîştina ku mirov çawa bû û ji ku derê hat e. Êlî Herîrî, di wê têgihîştine de bû ku mirov wê tî carî xwe bi tememî ne gihêne bersive wê pîrsa ku bi " ..ji ku derê hatin e". Heta ku ew xwe ne gihine têgihîştina rastiya xwûdê wê ev yek wilo bê. "Lê "xwûdê li ser me re ya. Ew bêşerîk û heval e". ..

Ev gotin û têgihîştina wê, di olên kurdan yê weke êzîdîtiyê yê ku berî musulmantiyê ji jîn bûna, di wan de heya. Yanî ev têgihîştin, tegihîştineke ku ye herêmî bû. Lê di ole îslamê de ji hate ser ziman û bicih bû. Berî her tiştî têgihîştine Xwûdayê Birehim Xelîl ye ku "ew yek e û ti û ti kesek li ser wî re nîn e", çawa ku di olê berî musulmantiyê de yê weke cihutiyan û filahiyan de bicih bûya, her weha di musulmaniyan de ji bicih dibe. Ev rastî, wilo ya.

Lê Êlî Herîrî, di têgihîştine olî ye musulmantiyan de ye li Kurdistanê û bi wê ji li ye herêmê bigiştî de hinek afirandinan dide çê kirin. Êlî Herîrî,

mirov ku li ser dihizirê, mirov dibîne ku sê awayên hizirkirinê wî kifşkirine. Yek ye olî ku ti carî nayê nîqaşkirin û ew bi pirtûkên pîroz tê dinyê ya. Ew ya ku tê carî wê ji berçav newê dûrkin e. Awayê duyemîn ji, her weha bi tewsîrkirinê ser ziman û ew bi ye yekemîmin ve girêdayî ya. Divêt ku mirov di afirandin pêşxistina wê de pir bi bal bêt. Divêt ku mirov pirt mazin bi zanebûn. Herkesek nîkarê wê bi afirêne û bêne ser ziman. Mirovê ku di riya xwûdê de na, ew karin wê biafirênin.

Di deme tewsîrkirinê de ji hinek pêvajoyên dem hene. Her deme tewsîra bi mirov re dide çêkirin. Tewsîrkirin, yê ku wê bike ji divêt ku ne dûr bê ji rastteqînîyê. Di tewsîrkirinê de, her dem biqasî ku tewsîre xwe diafirêne, wilqasî ji, tewsîrkiirn ji diafirêne. Lê di her demê de, ev ji heya. Pirtûka pîroz, wê di her demê de wateyekê bide mirov û bike serê mirov de. Divêt ku ev herdû tewsîr ne li dij hevdu bin û ji hevdu ne dûr bin. Lê divêt ku mirov vê yekê ji fahm bike, ji ber çî tewsîr tê kirin, jiyana ji ber pêş dikeve û divêt ku ew di rastiya rastteqînîyê re were ser ziman. Ji ber vê yekê ji, di deme afirandin û hizirkirinê re mirov bi ratiya xwe ye rastteqînî re ji berçav ji divêt ku newê dûr kirin. ..

Awayê sêyemîn yê hizirkirinê ji, hizirkirina ku mirov aqilê xwe bikar bêne û bi afirêne. Ev ji, wê jiyana mirov bi herdu xalên pêşî re bi pêş bixe û temenê wê çêke û mirov di wê deme meşandinê ya di demê de wê hevalbendîya mirov bike. Bi vê yekê li gor wî ev hersê nûqte ji hevdu temem dikin. Jev ne dûr in. Mirov divêt ku vê yekê fahm bike. Lê mirov deme ku aqil afirand ji, mirov divêt ku qeyretê bide nîşandin ku mirov ji rastteqînîya dûrnekeve û dernekeve. Her weha ev herdû xal ji girîng in.

Li gor Êlî Herîrî, ji xwe aqilekî jiyane ji heya. Ew aqil ji bi dîtina wê re ya. Ku mirov lê meyîzend û ew dît wê hingê wê çavê wê di cih de bê berçavên mirov. Lê ew aqil, xwe dihêlê ku mirov wê bêne ser ziman. Mirov wê çawa hanî ser ziman, wê wilo awa bistêne û di jiyane de çih bigirê. Bi têngihîştinê de Êlî Herîrî digihîjê têngihîştine "teqez (mutlaq) û ye ne teqezîyê". Ew jiyane teqez dibîne. Lê hundurê wê teqez nabîne. Hundurê wê heta ku jiyandin têde ye, wê biguharê. "Hemû tiştê ku li jiyane ne, mafê jiyane ji xwûdê standine". Bi vê yekê, heta ku xwûdê rihê wan ne stêne, wê ti kes nîkaribe bistêne. Yê ku bistêne ji, ji ber ku wê xwe bike cihê xwûdê de, wê xwe ji xwûdê re bike şerîk, ew ne tenê gunehêkî dike ew li ser kûfrê ji ya. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji biteybet bêne ser ziman.

Bawerî, di vir de, divêt ku mirov lê bihizirê. Ew vê yekê, weke pêdivîyekê dibîne. Bawerî, bi hizrekê ku xwûdê têde bicih kirya li dinyê

heya. Ji ber vê yekê, ku mirov ji baweriyê dûrnekeve, mirov wê ti tiştêkî wilo xirab û guneh neke. Ew wilo dibîne. Ji baweriyê dûrketin, berî her tiştî, dilê ji tiştêkî dî vekirin e. Divêt ku mirov wê ji bibîne. Ew mirovê ku dilê xwe her weha ji tiştêkî dî re ji vekir, êdî wê hertiştî ji bike, ku tiştên xirab ji di nav de. Bi vê yekê Êlî Herîrî, têkiliyekê di naqabîna baweriyê û kirinê de didêne. Êlî Herîrî, divêt ku mirov di vir de bi teybet bêne ser ziman ku ew zimanxweşiyê ji kirinaka baş û qanc dihasibenê. Ji ber vê yekê, ew pir mazin li ser vê yekê di sekinê û têne ser ziman. Zimanê xweş û xweşik, ew ji rastiya mirov ya baş dibîne. Bi vê yekê re ji têne ser ziman ji. Ji ber vê yekê, ew heta ku jê te, zimanê xwe dike ku xweş û xweşik bike. Ew di vê yekê de xwediyê têgihiştinekê ji ya. Bi têgihiştin, ev vê yekê dike. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Di vir de, divêt ku em careka din bahsa zimanê Êlî Herîrî yê ku wî di gotin û vegotinê de pir girîngî didayê de. ..

Êlî Herîrî, li ser mijar û hizrên deme xwe yên ku ser dihatina hizirandin û gotûbêjkirin ji xwediyê hizir û têgihiştinê bû. Wî hizre xwe ji dihanî ser ziman. Li ser mijara dil ye di hizir de ji, ew li ser disekinî. ”Mirov bi dilê xwe rast pak karê bijî. Mirov karê fahm ji bike. Mirov bidil ku ye safî û jidil û bidil di xwe de jîn kir, mirov wê hingî rast bê. Rastbûn, di nêzîkatiya mirov bi ye dilê mirov û têgihiştine mirov xwe dide der. ..”. Her weha hinek hizrên ku bi wî têne ser ziman ji hene. Ew bi vê yekê, li ser têgihiştine Tasawûfê disekinî. Tasawûf, têgihiştine wê bi Êlî Herîrî re heya. Êlî Herîrî, biqasî ku dinye xwezê ku xweşik bike û tede rast û li aqlê xwe bijî, wilqasî ji di xwe nêzî axireta xwe ji bijî. Her weha di nêzîkatiyekê de ya. Ew girîngiyê dide jiyana li dinyê. Ew vê jiyane, weke azmûneka li pêşiya me ku em tere bi buhurûn dibîne. Ev gotin, biqasî ku weke gotinaka xalkê di nav xalkê de tê gotin, ew ji bi têgihiştineka ku mazin têne ser ziman. Ev gotin ji weha ya.”Ma ku mirov dinye xwe baş û qanc derbas neke, mirov çawa li wê dinye din hasab ji kirinên xwe bide û jê derbas bibe? Dinye û jiyana wê, ji xwûdê çêkiriya. Tişte ku xwûdê çêkiriya, divêt ku mirov qadr û qiymet bidiyê de. Mirov xwûdê wî çêkiriya, divêt ku mirov qadr û qiymet bidiyê de. xweza û ajal û her heywanet xwûdê çê kiriya, divêt ku mirov qadr û qiymet bidiyê de. Rastî ji xwûdê çêkiriya û hanîya ser ziman û tede rastteqiniyek bicih kiriya, divêt ku mirov wê ji fahm bike û tê bigihê, Rastî, ji yekê zêdetir gelek wateyên wê hene. Ma ka mirov çende ji wan wateyan dizanê? ..” Her weha tê ser ziman ji ser navê wî. Êlî Herîrî, di têgihiştine hizrî de li

rastiyên mazin di gerihê. Ew hesanî ne hizirê û nabîne. Ew mazin di hizirê û mazin dibîne.

Rastî, li gor wî weke mirine ku ji mijgûlên çavên mirov nêzî mirov e nêzî mirov e. Lê ji bo ku mirov rastiyê bixwe ji bibîne, divêt ku mirov hinekî bihizirê. Rastî, ji bo dîtine wê baş, ji mirov nerîn û nêzîkatiyaka rast dixwezê. Deme ku li ser nêzîkatiyê bahs tê kirin ji, ev minaq tê dayîn. "Mirov, ku nêzîkatiyaka xirab li dê û bavê xwe kir, wê dilê wan nexweş bê wê hingî xwûdê ji mirov nexweş bê. Mirov, di gavavêtina xwe de gav bi gav diçê. Her gava me ye ku li duv ye li pêşiyê xwe tê, mirov wê dibîne. Baxtê wê gavê ji ew e ku li pey wê bê. Lê xwûdê wînek daya me ku em di wê de ji bigotin bin. Ji ber vê yekê, ez karim bêjim ku her mirov ji nêzîkatiya ku li dinyê ku çawa ji da nîşandin bi bersivekar e. .."Piştî gotinaka ku di nav xalkê e tê ser ziman li duvê gotinê tê ser ziman û weha tê gotin, "haçiyê ne zehmet wê nexwe nehmet". Ev gotin, her weha bi vê rastiyê ve girêdayî, tê ser ziman, ku mirov divêt ku xwe ne berdê ji. ..

Li dinyê berda, mirov wê di axîreta mirov de ji bide berdan. Berdan, li gor wî gotinaka pir girîng e. Berdan, di wate ji baweriyê derketin û ji rê derketin ji dihête ser ziman.

Êlî Herîrî, di wê heyemê de deme ku li qasrê li mîr û mirovên li dora xwe rûniştî bû, her weha hinek gotin ji ji devê wî bi bawerî û rastîya ku mirov wê bişopêne ji devê wî derketibûn. Rastîya ku mirov wê bişopêne, rastîya ku mirov wê pê herê û bigihê rastîya xwe bixwe ji. Her weha ev vê yekê pir girîng dibîne. "Ma ji ber çî hizirkirin derketiya û afirîya. Ji bo ku mirov xwe naskê û rîya xwe bibîne. Rê di hizirkiirne de dîtî, mirov digihêne rastîya cem xwûdê. Ma winê dizanîn?". Rastî, têgihîştin, bawerî, jîyan û mirov di vir de hevdu temem dîkin. Ji ber ku mirov bê bawerî najî. Bawerî ji bêzanebûn û têgihîştin nîn e. Zanebûn û têgihîştin ji bê rastî nîn e. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bibîne û têbigihê. Di wê heyemê de deme ku Êlî Herîrî axiftibû, hingî wî bahsa dîtina bi çavan û nerîne bizanebûna yanî ya bîaqil kiribû. Di wê de li ser têgihîştinê pir mazin sekinî. Hingî ji, bi wê axiftine xwe ye bi zanebûn û aqil re gotinên xwe wilo xweşik û siaphî hanîbûn ser ziman, ku bigotinê nayê gotina. Hingî wilo xweşik û sipahî hanîbû ser ziman. Wî, rast axiftin ji ji têgihîştineke ku ne dûrî baweriyê ji di dît. Wî xweşik û sipahî axiftin, qatek ji rastiyê û qatek ji ji mirov di dît. Ev herdu deme ku digihine hevdu, êdî zanebûnek derdikeve. Lê deme ku mirov wê bêne ser ziman, hingî mirov bi bawerî ji ku hanî ser ziman, wê hingî wê rastî di wê de û

bi wê re wê derkeve holê. Mirov, deme ku li dora xwe dimeyîzenê, mirov gelek rastiyên ku ji aliyê Xwûdê ve hatina afirandin dibîne. ”Rastî û hebûn di wir de bi hev re ye li berçav e”

Di wê demê de wî hinekî wilo hanîbû ser ziman. Û pêre ji, ku wilo xweşik û sipahê hanîbû ser ziman, ew bi tememî di bin bal û nerînên mirovên li dora xwe de mabû. Ew her weha êdî her timî li berçav mabû. Piştî wê axiftina wî re, mirovên din yên ku diaxiftin ji, bala wan di deme axiftina wan de li ser Êlî Herîrî bû. Piştî axiftinê ji, her weha hizrek bi wan re dibû. Ne di axiftinê û ne ji di hanîna ser ziman de hatina asta ku Êlî Herîrî di wê heyemê de hanî ser ziman. Her weha hîsek û têgihîştinek bi hev re bi wan re çêdibû. ..

Êlî herîrî û mirovên li dora wî di qasra mîrê bota de ku li ber mîrê bota demeke dirêj wilo bi hev re diaxivin û demên xwe di buhurênin, piştire êdî ku xwarin ji hatibû berwan û xwaribûn, piştire, weke ku êdî dem hatibû deme rabûnê ji bo wan. Deme çûna mizgeftê û mêjkirinê hatibû. Ew ketibû bîran de. Piştî ku wilo hatibû bîrê, êdî hin bi hin hizre rabûnê di serê mirovên dorê de bicih dibû. Hin bi hin yên ku li dora xwe dimeyîzandin, di nerîne xwe ye ku pê dimeyîzandin de, ev yek didene der li berçav. Êlî Herîrî ji, çend ku ew hê nû bû li wir wî ev yek ji nerînên ku afirî bûn fahm kiribû di wê heyemê de. Ew ji di serê wî de hizre rabûnê afirî bû. Lê yekî ji di wê heyemê de hê bahsa rabûnê ne kiribû.

Lê ku hinek dem têve çû, piştire ne bi gelekî re yê ku bahsa rabûnê kir, Şêx Saîdê Cizirî bixwe bû. Ku wî bahs kir, êdî bê gotin û sîal, herkesekê bidest xwe amedekirinê di cihê xwe de kir. Şêx Saîdê Cizîrî, mirovekî ku birêz û mazin bû. Ew yekî pir bizanebûn bû. Navê bi şêxtî û zanebûna wî re derektibû. Ku Bahsa wî dihate kirin, weke ku bahsa yekî ku pir mazin yekî ewlîya bê kirin, bahs dihate kirin. Ew di zaenbûn û şêxtiye xwe de ji wilo bû. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji ji bo wî bêne ser ziman.

Piştire ku hinekî dî dem têve çû, piştire êdî bahsa rabûnê hate kirin. Êdî her weha kara rabûnê hate kirin. Di wê heyemê de gelek mirov li hevdu kom bûn. Hemû ji yên ku bizanebûn bûn. Gelek ji wan yên ku sofî û mirîd ji bûn. Wan sofî û mirîdan ji temenê xwe heta wê deme hema bêja hemû bixwandin û kirina wilo buhurandibû. Ji ber vê yekê mirov karê ji bo wan ji bêje ku ew pir bizanebû bûn. Zanebûnaka wan ye pir mazin ji hebû.

Ew ji, her weha wilo bû. Deme ku bahsa sofîyekî bihate kirin, dihate gotin ku ew divêt ku nekemî yekî zane bê. Ku cihê wê hat divêt ku karibe

bibe seydeyek. Ku cihê wê hat, divêt ku karibe ku bibe weke yekî zane û bizanebûn gava xwe biavêje. Her weha mirov divêt ku ji bo wa vê yekê bêne ser ziman. ..

Êlî Herîrî, di wê heyemê de, bala wî li ser dora wî bû. Wî hizir dikir ku Şêx Saîdê Cizîrî çawa gav avêt, ew ji wê li gor wê û bi wî re biavêje. Wê ew rast bêt. Her weha wî di serê xwe de di bir û dihanî. Bi vê yekê re ji êdî bala wî li ser wî bû. Lê dimeyîzend.

Piştî ne bi gelekî re êdî ji xwe kara kirin û dana xwe û rabûna ser xwe ji cihê xwe di wê heyemê de. Ku rabûna ser xwe di wê kêlîkê de, êdî Êlî Herîrî ji rabû ser xwe û ew di rex Şêx Saîdê Cizîrî de sekinî û bala xwe da wî ku ew wê gava xwe çawa û bi çi awayî biavêje. Piştî ku ew rabûna ser xwe, êdî di cih de du sofiyên ku li wir rûniştî bûn, bi lez xwe nêzî şêx Saîdê Cizîrî kirin ji bo ku pêre bimeşîn û da qana alikariyê ji bidinê de di cihê de. Lê Êlî Herîrî, li aliyê şêx Saîdê Cizîrî yê çapê ma û ew keta cihê ku wê li wî aliyê alikarî bida şêx Saîdê Cizîrî. Piştî wî ew ji kir. Wî destê xwe avêta cengê Şêx Saîdê Cizîrî û pêre kir ku bimeşê. Êdî ew bi hev re ketina rê de û meşîn û hatina pêşiya civatê û ku êdî mîr ji hat û keta rex wan de ji aliyê çapê di rex Êlî Herîrî de, êdî bidet meşîna xwe ye ku wê pê derkevin kirin.

Ku wan bidest derketinê kir, êdî piştî ne bigelekî re derketin û ku derketin ji êdî bi hev re ketine rê de û hatina bi ber mizgeftê ku di rex tirba Nebî Nuh de hatibû çêkirin de. Wê li wir êdî kara xwe kiriban û û mêj kiriban û piştî wê bi hev re hinekî li wir ji rûniştiban û wê êdî piştî ji wir rabûban û derketiban. Di wê heyemê de ji ber ku deme mêje bû, gelek mirov li dora wan gihiştibûbûna hevdû. Hemû ji bi hev re dimeşîn. Êlî Herîrî, di wê heyemê de ew bi şêx Saîdê cizîrî re ketibû safî herî pêş de. Ew li pêş li berçav bû. Bal ji bi vê yekê pir mazin hatibûn ser wî di wê heyemê de. Ew, çawa di deme di civatê de li hevdû rûniştî bûn û ew axiftibû û wî bi axiftina xwe ye ku kiribû re bal kişandibû ser xwe û êdî bal li ser wî mabûn, di wê heyemê de balên ku li ser wî bûn heman rewş dihanî bîra mirov. ..

Piştî ne bi gelekî re ku digihine mizgeftê, êdî kara xwe dikin û êdî mêj dikin û piştî li mizgeftê li hevdû ji hinekî dirûnihin. Weke demeke dirêj li hevdû dirûnihin. Mizgefte ku li ber tirba Nebî Nuh hatibû Çêkirin, di wê demê de navê wê pir mazin derketibû. Ji gelek herêmên kurdistanê û bigiştî ji herêmê dihatina wir û hinekî li wir diman û piştî diçûn. Berî hingê bi demê re Ji rojhilatê kurdistanê ji hinekî mirov hatibûn. Ew ji şêxên kurd bûn. Ji herême başûrê kurdistanê ye Dînwerê Şêx hûseynê

Dînwerî bi gelek mirîd û sofîyên xwe re hatibû wir. Ji ûrmîyê şêx Xûsrewîyê Ûrmîyî her weha bi heman awayê hatibû. Lê deme ku Şêx Hûseynê Dînwerî ji Dînwerê hatibû ew pir qalabaix hatibû. Ne tenê sofî û mirîdên wê pêre bûn. Gelek zanîstên herêmê ji pêre gihiştibûbûna hevdû û hatibûn. Yên weke Faqa Sîneyê heketenî ji hebûn. Ev mirovên wilo nav dabûn bi zanebûn û pêşketine ku di xwe de çêkiribûn. ..

Li Dînwerê dergaha mazin hebû. Li wir, şêxê ku li dergahê durûniştin, pir mazin di wê heyemê de bi zanebûn û şêxêtiyê xwe re nav dabû. Ji ber vê yekê li herêmê bigîştî navê wî derketibû. Li dora wî, gelek mirovên ku zane ji bûn xwe dabûbûn hevdû.

Di deme ku Şêx Hûseynê Dînwerî hatibû wir, himgî, ne tenê sofî û mirîdên wî pêre hebûn. Hingî mirê wir ji birrek sûwar ji bo awlakariya wan bi wan re şandibû wir. Ew heta ku şêx li wir li Cîzire bota ma, ew ji li wir man. Piştî, weke ku çawa ku bi hev re hatin wilo ji bi hev re vegerehan û çûn. Di wê heyemê de ji gelek zanîstên kurd yên ku ji aliyê başûr rojava hatibûn li wir hebûn. Ji xwe zanist û seydeyên wir, di demên xwe de ku hîç neba ji, carekê wan xwe digihanda wir. Ew der, heta ku digihişt helebe û ber Şamê ji her weha bi wir ve zanîstên wan diharîkîn. Ji Şamê ji yên ku dihatina wir, xwe digihandina Cizire bota. Ji Cizire bota ji, mirovên ku zane bûn xwe digihandina şamê û li wir hinekî diman. Ji ber ku ew der, piştî hatina musulmanetiye êdî weke navendekê bidest pêşketinê kiribû. Ew der, dereke ku weke ku dibû navend ji gelek herêman re. Ji nîvgiraba araba yên ku zanist bûn xwe digihandina wir û ku xwe digihandina wir, êdî ji wir karibûn ku xwe bigihandinan Cizire bota û Rihayê ji. Ev herdû der ji pir girîng bûn. Warê Birehîm Xelîl Riha bû. Ware Nebî Nuh ji Cizire bota bû. Ev herdû der ji, piştî pir mazin navê wan û girîngiye tê fahm kirin û êdî yên ku hinekî fahma wan heba dihatina vanderan. Weke ku biçûyan hacê dihatina vanderan. Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman û bêje. Ji Herême şamê û dora wê û herême Botanê wanderan pir zêdeyê bi ser hevdû de çûyin hebû. Ji herêmên rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê ji wilo çûn û hatin hebû. Lê ne weke çûna van herêman ye bi ser hev de bû.

Li Başûr kurdistanê û rojhilatê kurdistanê, hinekî çûn û hatin bisekn bûbû. Piştî şerê li kerbalayê, êdî di demeke kin de hin bi hin çûn û hatin kêmbibe. Dergahên herêmê bi têngiştinê newîyê pêxember hasan û Huseyinê Alî di meşîn. Her weha êdî cudabûnak di naqanbîna herêman de bûbû. Wê şerî bi ancâmên xwe yên piştî, bandûraka mazin li têtikiliyên kurdan bixwe ji kiribû. Têtikiliyên nava wan dabû guharandin.

Dergahên herêmên başûr û rojhilatê kurdistanê aligirtiya wan dikirin. Wan bi xwe re ew rewş afirandibû. Şêxên herêmê sofî û mirîdên xwe ji wilo perwerde kiribûn, wan xalk û dora wilo perwerde dikir. Kurdistanê piştî şerê Kerbala re, weke ku di nav xwe de bi wê rewşê êdî dibe du qat. Weke aliyê şîî û aliyê ne şîî. Her weha rewşek afirî bû. Rêveberên kurdan yên van herêman ji, wan xwe li gor wê rewşê û pêşketinên wê yên ku piştîre bûn bi têxistin kiribûn.

Başûrê kurdistanê bi herêmên weke herêmên Zaxo û dordorê wê re bi tememî bi aliyê botanê ve xwe dihanîn ser ziman. Lê bi wê têgihîştinê û awayê wê pêşketinê ew ji hin bi hin mazin dibûn. Di wê demê de ji van herêman, ku yek ji herêmekê, ew guharandin pir baş hîs dikir. Her weha rewş afirî bû. Bawerî, bi têgihîştin pêş diket. Hizir û aqil bi hev re êdî mazin pêş diket û pêşketinên ku dibûn ji riya wan ye ku tere diçûn dide kifşkirin. Aqil, dem û pêşketine xwe di van de mazin dide der. Lê ev dem, ku mirov ji vî aliyê ve tene ser ziman, mirov divêt ku bêne ser ziman û bêje ku pêvajoyaka pêşketine ya bîaqil bi teybet ji weke di afirî. Hizir, di xwe de dihate kifşkirin. Çend ku hizir dihate kifşkirin ji, dihate dîtin ku aqil çiya û neçiya. Her weha ev ji dihate dîtin. Di pêşketine aqil û deme wê de, weke ku demeke hemdem deme xwe dijî. ..

Êlî Herîrî, li ser van mijar û bûyinên ku bûna ji hzire wî hebû. Ew di têgihîştineka ku bi hev re jev ne dûrbûn bibe de bû. Her weha wî hizre xwe dihanî ser ziman. Bawerî, ma ne li olê bû, belê!. Êê ka çima wê çî mirov jev dûr bike. Hizirna wî yên wilo ji hebûn.

Piştî ku Êlî Herîrî û ew bi hev re hatibûbûna mizgeftê û bi hev re kara xwe kiribûn û mêj ji kiribûn, piştîre êdî li hevdû rûniştibûn û bi hev re bidest axiftinê kiribûn. Bi hev re di wê heyemê de ketibûbûna danûstandinaka pir mazin de. Ew danûstandina ku wê demê ew ketibûbûnê de ji ya ku di qasrê de ketibûbûna de ne kêmbi danûstandin bû. Her weha mirov karê bi teybet bêne ser ziman. Êlî Herîrî, di wê heyemê de, car bi car diaxift. Ew êdî bi ser xwe ve hatibû û êdî diaxift. Wî êdî hizre xwe dihanî ser ziman. Di wê heyemê de êdî wî ji car bi car ku diketa derbe xwe de û mafê axiftinê ji dihilda êdî diaxift. ..

Wê rewşê wilo berdewam dikir. Wilo ew di nav hev de diaxiftin. Mîr, şêx û Êlî Herîrî û mirovên ku sofî û mirîd yên ku li dora wan ji ku li wan dihisandin, bi hev re diaxiftin û danûstandinaka pir mazin de. Wilo ew deme xwe di buhurênin.

Êlî Herîrî, êdî li Cizîre bota bû. Ew wê êdî demeke xwe ye dirêj wê li wir buhurandiba. Wî li wir jiyane xwe ye bizanebûn wê bi pêş bixista.

Jiyan, êdî ji bo Êlî Herîrî bi zanistî û mazinbûnê wî re jê re û pêre dest pê dike. ..

-----o0o-----

Jiyan li Cizîre bota li ber diclê pir xweş û geş e. Ji Her derî hatina wir heya. Yên ku têne wir ji, an yên ku tèn ku li wir hinek znebûna mazin bikin û an ji yên ku etartî û bazirgantî dikirin bûn. Her weha bi vê yekê ji çûn û hatinaka mazin hebû.

Ji her der û deverê kurdistanê mirovên ku dihatina wir hebûn. bi giranî ji hemû yên ku dixwestin ku zanebûna xwe mazin bikin bûn. Yên ku ji bo xwandin û bi pêdeçûnê dihatin bûn. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman. Mirovê zane, li zanebûnê digihêre. Ku li ku derê zanebûn hebe û lê bi kom ê, wê herê û xwe bigihêne wir. Her weha ev weke xosletekî wî ya. Lê bi teybetî ji, ew xosletê wî yê ku ew di nav xalkê de her timê bi nêzîkatiyaka cuda û bizanebûn dimeyîzenê û têne ser ziman û bi vê yekê ji xalkê re dibe kifşkarekê xweza ji, bi pêş dikeve bi wî re û gavavêtinên wî re. Zanebûn, ji jiyanê ya. Ji mirov e. Mirov ji di jiyanê de ya di jiyanê de dijî. Çend ku di jiyanê de dijî ji, her weha wilo ji mazin dibe û mazin dike. Ev xolstê zanistên mazin in. Zanistên mazin, rastiyan têne ser ziman û ji wê yekê ji bi şûn ve gavê neavêjê bi şûn ve. Her weha mirov divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Mirovên, ku dihatina cizîre bota, dizanîn ku li wir çendî zanebûnaka mazin heya. Lê ev dizanên ku çendî li wir nirxen mazin bi dîroka xwe re hene. Li wir, wê herdû ji bidîtan û kifş bikiran. Ev yek ji ji wan û zanebûna wan dihate xwestin.

Ma Êlî Herîrî ji ber çî hatibû wir? Ew ji ma ne ji ber vê yekê hatibû wir. Li wir, nirxên ku wî dîtiban û xwandiban û fahmkiriban hebûn. *Fahmkirin* û *zanebûn*, du gotinna ku mirov wan bi teybet bêne ser ziman bûn. Gotina *aqil* ji wilo ya. Di nav xalkê de car bi car ku dibû mijara aqil û zanebûnê, her timê êdî fahmkirin derxistina wê ye pêş dibû. Dihate gotin ku "divêt ku mirov fahm bike". Her weha dihate ser ziman. Ku yekî neqanciyaq ji kiriba û tiştê ne hatiba pejirandin bikira ji, jê re dihate gotin "ma ti wilqasî bêaqil bûyî ku te ev kir". Bi vê yekê re rexneyek ji hebû li mirovê ku ew tiştê ku ne dihate pejirandin kiribû. Wilo êdî ew dihate kişandin li ser riya rast û qanciyaq. Lê divêt ku mirov ji bîr nekê ku ev gotin, ne tenê weke gotinekê bû. Weke ku hinek nirx û kevneşopîyeke bîaqil ye jiyanê dihanî ser ziman. Ji ber ku demne mazin bi ser vê gotinê

û gotina wê re buhurtibûn, êdî ev yek wilo bûbû. ”Biaqilî kirin” û ”bi zanebûn gav avêtin” bêjeyne ku mirov her timî di jiyana xwe di serê xwe de weke hinek xalna digirt bûn. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Herkesekî êdî bi zanebûn gava xwe diavêt. Ti kesekî ne dixwest ku tiştê bikira û jê bihate ku ”ma ti bêaqil bûyî ku te ev kir”. Ji ber ku ev gotin yê ku dihilda, êdî yên ku ew gotin hisdikirin ku yekî hate gotin, êdî ji bîr ji ne dikir. Hebû ku êdî piştê di civatan de ji bihate gotin ku wilo ji yekî hate gotin. ..

Êlî Herîrî, ew demek bû li cizîre bota bû. Ew bûbû wek yek yê wir. Her weha êdî hatibû Naskirin. Lê divêt ku mirov bêje ku di wê deme ku ew li Cizîre bota mabû de, li herêmên li dora Cizîre bota wan gerahabû. Ew deran ji û mirovên wan deran yên zane û pîroz ji wî dîtîn û bi wan re demne xwe yên ku cem wan mabû de bi wan re buhurandibû. Bi vê yekê, êdî ew li herêmê di nav alim û şêxan de hatibû naskirin.

Êlî Herîrî, ew demek bû ku li wanderan bû. Li herêmê hema bêja li dergahên wê yên ku hebûn li hemûka ji geraha bû. Ew ji dîtibûn. Êlî Herîrî, deme ku deme ku dikeve rê de ji Cizîrê û li herêmê digerihe, êdî ew heta deverên dûr diçe û wanderan dibîne. Lê ew ne bi tenê ya. Pê re sofî û mirîdên wî yên dergahê hene.

Li her herême ku di çiyê de, li wir bi mirovên zane û şêxên ku wan dibîne re bi wan re di rûnihê û li wa dihisêne. Lê Êlî Herîrî, divêt ku em di vir de bînine ser ziman ku her devere ku diçiyê de ji, li wanderan, çî dikeve destê wî de dixwêne. Her weha ew nêzîkatiyaka wî heya.

Piştî ku ew hatibû hatibû Cizîre bota, êdî gelek mirovên ku ew ji rihayê û wan deran hatibû ji wî ew dîtibûn û bi wan re rûniştibû û li wan hisandibû. Ji wan di derbarê riha û dergah û şêxê wir de ji bûbû xwedî zanebûn. Bi vê yekê re ew di demê de, êdî xwestina xwe gihandina wir pêre çêdibe. Di wê heyemê de li Xizanê, Heskîfê û hwd, herêmên wilo ji di wanderan de ji, ew rastî mirovên ku ji wan rederan têne wir rastî wan deran tê. Amed bi xwe ji herêmeke ku navê wê hebû. Ew herêm ji, herêmeke ku pir li wir levcivîn dibû bû. Li wir ji dergah hebû. Pêre ji medresa wir pir navê wê derketibû. Ew der, piştî Merwanî hatibûbûna ser desthilatdariyê, êdî li wir pir mazin pêşketine ji aliyê rêveberiyê ve xwe dabû berçav. Li wir ji û li dora wî ji her weha pêşketinne ku mazin bûn hebûn. Ev hemû bûyin û kirinên ku dibûn, Li Cizîre bota bahsa wan di hate kirin. Ku bahsa wan di hate kirin, êdî Êlî Herîrî ji hij dikir. Bi vê yekê êdî bala wî diçe ser wanderan ji. ..

Êlî Herîrî, li herêmê, bi Şêx Saîdê Cizîrî re li wir li herêmê li hinek deveran digerihe. Lê piştêre ku ew hinekî bi hev re li herêmê digerihe, êdî piştêre ne bi gelekî re, ew ji êdî bi hev re divegerihina Cizîre bota. Lê wê cara dawî ku divegerihina Cizîre bota, êdî di serê Êlî Herîrî de çêdibe ku ew rêwîtiyekê bi van deran ve bike. Ew mêhle wî pir diçê ser Rihayê. Ew li wir dihizirê. Di wê heyemê de ji şêxê dergaha Heranê ji li wir bû. Ew ji ew demek bû ku li wir bû. Hatibû wir û li wir demekê mabû û wê êdî ew ji wir çûba û vegerehe ba Heranê. ..

Piştêre ku demek têve diçê, êdî piştêre şêxê heranê xwe li ser rê kar dike û dike ku vegerihe. Piştêre ku Êlî Herîrî dibîne ku wa wî xwe li ser rê karkiriya, êdî ew ji dike serê xwe de ku pêre herê û wir ji bibîne. Ew der, di wê heyemê de bi navê Bîrehîm xelîl ji pir mazin li ser zimanan bû- Pir bahsa wê ji dihata kirin. Êlî Herîrî ji pir mazin navê wê his dikir. Ew, deme ku li civatan li hevdû dirûniştin, pir mazin di derbarê Bîrehîm Xelîl û Rihayê de bi hev re his dikir. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku êdî tema wî ji çûbû bû ser wir. ..

Êlî Herîrî, piştêre ne bi gelekî re ku şêxê heranê şêx Bîrahim dikeve rê de, êdî ew ji bi wî re dikevê rê de. Şêx heranê, pê re pir mirov hebûn. Sofî û mirîdên wî pir pêre hatibûn. Êlî Herîrî ji mirovên ku pêre bûn hebûn. Ew ji yên ku hê ji deme ku ew ji dergahê hatibû û pêre bûn hê pêre mabûn. Ew hê pêre bûn.

Di wê heyemê de deme ku Şêxê heranê xwe amede dike li ser rê êdî ew û Êlî Herîrî êdî bi hev re xwe amede dikin û piştêre ne bi gelekî re êdî dikevîne rê de ku herine wir. Êlî Herîrî, ew der ji di serê wî de mabû. Piştî ku ew hatibû Cizîre bota, êdî pir mazin di derbarê herêm û dergahên wê de his kiribû. ..

Piştêre ku ew dikevîne ser rê de, êdî ne bi gelekî re ew tên û têne Rihayê. Ku têne rihayê, êdî bin awlakariyekê de têne wir. Mîrê bota, wan bi awla dişêne wir. Mirovna bi wan re bi sûwar dişêne ku hate ku wan bigihênine wir û piştêre vegerihe. Her weha hinek mirov ji bi wan re diçin. Lê herêm bixwe ji hêzê wê hebûn. herêm bi herêm, ku mirov diketiyê de, hêzên kurd yên herêmî mirov rastî wan dihat. Ew ji, deme ku ketibûbûna rê de, êdî her cihê ku gihiştibûbûnê de rastî mirovên herêmî yên ku hêzên herêmî diafirandin. Her dere ku ew digihiştinê de ku dihatina naskirin ji, êdî rastî eleqeyê mazin dihat in.

De ne, leşkerên qasra mîrê bota bi cil û bergên xwe ve ji her aliyê ve kifş bûn. Deme ku mirovan ew di dîtin, êdî ew nas dikirin. Ku ew dihatina

dîtin, êdî ku dihatina fahm kirin ku sa sûwarên mîrê bota ne, êdî rastî eleqeyeke mazin dihatin.

Li Hinek herême ji, ew ji sekinî bûn bêhne xwe berda bûn. Piştî ku bêhne xwe berda bûn û hinekî mabû, piştî bi rê ketibûn. Lê ew her herême ku diçûnê de û lê dimana sekinî ji, li wir, rastî eleqeyeke mazin dihatin. Li wir, ku ew dihatina nas kirin, êdî aliyên mirovên mazin yê herêman ve dihatina pêşwazî kirin û dibirina qasran û li wir dihatina ragirtin û azimandin.

Bi vê yekê, ew rêwitiya xwe di buhurênin hate ku têne Rihayê. Ku hatina rihayê, êdî li wir rastî eleqeyeke mazin tên. Êdî li wir rastî pêşwazîyaka mazin tên. De ne, êdî şêxê wan vegerehe bû. Ma wê çawa mazin ne hatina pêşwazî kirin. Ew wê mazin bi hatana pêşwazî kirin. Wî, weke ku şahiya wan ba, wê ji wan re bûba.

Êlî herîrî û Şêxê heranê ku bi hev re têne wir, êdî li wir bi hev re demekê di buhurênin. Li wir êdî bi hev re lev dirûnihin. Êlî Herîrî li wir ji tê nas kirin. Li wir weke ku çawa ku li Cizîre bota tê nas kirin, li wir tê naskirin û navê wî derdikeve. Ew weke alim û şêxekî bizane navê wî derdikeve. Lê ew ji herkeekî cuda bi wê zimanxweşiya xwe re ji navê wî derdikeve. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Zimanê Êlî Herîrî pir xweş bû. Pir zimanekî wî yê bizane hebû. Wî bixwe, ceran weha digot; ”mirov ku bitêgihîştin û hizir bû, wê êdî zanibe ku wê bi gotinên xwe re bêne ser ziman. Wê hingê ew pir baş û qanc zanibe ku bi xivê ji.” Bi vê yekê, têgihîştinek dihanî ser ziman. Tişte ku mirov ji van gotinan fahm dike, her weha ew ku mirovê ku xwedî felsefe ne, yê ku karin pir xweşik bi xivîn û bînine ser ziman û gotinên xwe bi têgihîştin xweş bikin û ji mirovên li dora xwe re bînine ser ziman.

Êlî Herîrî, piştî ku hat û gihîşt Rihayê li wir li dergaha şêx êdî bicih dibe û li wir demeke xwe dimêne. Di wê demê de ji xwe dide fahm kirin û pêşxistina têgihîştinê ya bi xwe re di wê heyemê de. Ew wilo demeke xwe mazin di buhurêne. Li Rihayê di wê heyemê de, pêşketineke mazin hebû. Mirovên ku li herême xwe li dora çemê wê yê bi navê *Firatê* lê digirtin. Çemê *Firatê*, çemekê ku ew der pê dirabûn bû. Rewşe her kesekê bi deronîya wan re jê xweş bû. Her demsalê ji sad bigire hate ku digihîşt, pir tiştên din ji, bidest dixistin.

Bi vê yekê, mirov karê bêje ku rewş wan pir xweş bû. Lê dem bi dem hin herîşên hovan yê li ser serê mirovên herêm dibûn û di wan herîşan de zerer û zîyeneke mazin digihîşte wan û malê wan. Lê çend ku hêrîş dibûn ji, jiyana wan hebûna xwe bixwe dide berdewam kirin. Mîr û

mazinên herême lev digihîştine hevdû û li ser ka wê çî bikin diaxiftin bi hev re. Bi vê yekê, dixwestin aramiyaka xwe ava bikin. Herême musulman û êdî ji hebûn. Hinek filah ji hebûn. herkesek di rewşê xwe de jiyana xwe de berdewam kirin. Piştî ku romîyan hê di demên berî wê demê de hatibûbûna herêmê û di herêmê de ketibûbûna şerna de di wan şeran de xuruxandinaka mazin li herêmê bûbû. Tevî ku bi ser ve demne pir dirêj buhurtibûn, hê ji, nîşana û şûnpêyên wan hebûn. ..

Lê li ber wî çemî, wilo zêde dem ji ne dihilda ku ew jiyana xwe careka din bînine ser serêberê di cihê xwe de. Ev yek û derfet û hêz û şiyana wan hebû. Wan, ew hêz û şiyana xwe ji wê pêşketine xwe ye li ber çemê Firatê digirtin. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman.

Di jyanê de hêz û şiyana mirov di pêşketin û pêşveçûnên mirov de xwe dîyar dide berçav. Her weha mirov karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Êlî Herîrî, piştî ku tê wir bi hinek mirovên ku pêre ne, bi şêxê wir re, êdî li wir hinekî dimêne. Li wir ji, bi hinek zanist û mirovên mazin re di rûnihê û xwe li wan dide hisandin. Hizre ji wan re têne ser ziman. Bi vê yekê her weha ew navê xwe li wir ji dide derxistin. Demekê ew li wir dimêne. Di wê deme ku ew li wir dimenê de li wir, bi gelek zanistên herême re dirûnihê. De ne, li wir, pêşketineke mazin hebû. Ne tenê zanistên herêmî yên ku bi aslê xwe arab ji bûn, di wê demê de dijîn ji xwe gihandibû bûna wir û ji wir pir tişt fêr kiribûn û dixwe de dabûn rûnandin. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bêne ser ziman. Zanistên herêmê pir hebûn. Ew herêm, piştî ku Rêveberiya musulman pêşket û Şama ku nêzî wir e ji xwe re kir wek navendekê, êdî piştî li wir ji bizanebûnê kombûneke li berçav diafirê û çêdibe. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bêne ser ziman.

Deme ku mirov di wê demê de xwe digihanda Rihayê, êdî mirov dibû xwediyê gelek agahiyên di derbarê wê herêmê û pêşketine wê de ji.

Êlî Herîrî, piştî ku li wir demekê dimêne, piştî êdî ew herême hema bêja hemûkî nas dike û pêşketine wê fahm dike. Zanistên herême yên ku hene ji bi wan re dirûnihê û dan û standinê dike. Her weha ew di rewşekê de dimêne. Êlî Herîrî, piştî ku demekê li wir dimêne, piştî, êdî dike serê xwe de ku xwe bigihêne Şamê ji û wir ji bibîne. Herêmên kurdan yên weke Rihayê heta ku digihîşt başûr rojavayê kurdistanê di bin ewlakariya merwanîyan de bû. Çend ku hêrîş dibûn, yên ku herîş dikirin, wilo zêde êdî ne dikarîn bi ser bikevin. Piştî ku musulmanetê hatibû û ew

herêm kiribûbûna nava xwe de, êdî wilo zêde li wan herêmêna hêrîş ne dibûn. Bi rastî ew bû ku êdî wilo derfet ji hêrîşên hovana re ne dima.

Lê hê ji yênkû di bûn hebûn. Lê herêm bi tavahîya xwe, di bin awlakariya hêzên herêmî yên kurd de bû. Her herêm bi qasr û mîrê xwe re xwediyê serekê xwe bû. Dergah ji her weha di wê astê de xwediyê weynekê bûn. Lê mîr, yê herî zêde ku bi wî karî ve mijûê dibû bû. Şêx ji, li ser wî cih digirt.

Êlî Herîrî, ji wir, deme ku biryara xwe dide ku herê Şamê, êdî li wir mîrê wir yê ku xwediyê hêzekê mazin bû, êdî wî hêzek dabû avakirin û deme ku wan gotibû emê herina Şamê, êdî wî ji ji wan re gotibû, "bila ew we bi xêr û selemet bigihênine wir". Bi vê yekê êdî piştê ji Êlî herîrî kara xwe dikê ku ji wir herine wir û wir ji bibîne. Êlî Herîrî, mirovekî ku bi meraq bû. Wî di xwest ku wan herêman bibîne. Li herêman gerîn ji, weke xosletekî zanstên demê yên bi hizir derketibû pêş. Zanistê weke Mêciyê mêjehî jî ku li herêmê demekê mabû, êdî ji wir xwe gihandibû şamê û ji wir heta bi mekihê û medîne çûbû. Piştê ji wan deran ji vegerehe bû û hatibû Cizîre bota û piştê ji wir çûbû rojhilatê kurdistanê û ji wir wî xwe gihandibû başûr û ji başûr ji çûbû bû heta baxdayê ji. Piştê re ji wir tê Xorasanê û li wir demeke dirêj dimêne. Xorasan, di wê demê de pir pêşketî bû. Navê wê bi pêşketin û bi çûn û hatina bi lê derketibû. Her weha ew der mazin bû. Mirov divêt ku vê yekê bi teybet ji bêne ser ziman.

Êlî Herîrî ji, heya wî ji waqas zanist û hizirvanên demên berî wî hebûn. Di wê heyemê de li Şamê gelek alimên musulman levghiştibûbûna hevdu. Ji ber vê yekê, wî ji dixwest ku ew herê wir û wir û wan alimên li wir bi bîne. ..

Piştê ku demek têve diçe, êdî ew ji wir bi gelek mirovên ku pêre bûn û hinek mirovên ku ji Rihayê ji pêre ketibûbûna rê de dikeve rê de ku herê Şamê.

Li Rihanyê, Êlî Herîrî, demeke pir baş buhurandibû. Divêt ku mirov çend gotinan li ser wê bînine ser ziman. Ji ber ku ew yek ji her weha girîng e. Di pêşketine wî de, Biqasî deme wê ye ku li Cizîre bota mabû de ew deme wî ye ku li wir mabû ji dibe xwediyê hebûneka mazin di wê heyemê de. Êlî Herîrî, hê ji ciwan bû. Lê ew êdî weke şêxekê navê wî derketibû û êdî mazin dihate nas kirin. Bi zanebûn û bi wê xweşik axiftin û "maqamata" xwe re tê nas kirin. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Maqamatê wî pir xweş bû. Ku diaxift, weke ku mirov ji xwe bibe li mirov dikir. Ew awayê axiftina wî pir balaka mazin

dikişêne ser xwe di wê demê de. Ew her dere ku diçiyê de wê awayê xweşik ku pê diaxift dide nîşandin. Her weha ev yekî ku bi zimanê xwe re pir mazin li pêş bû.

Êlî Herîrî, êdî ne weke xwandavanakî û an ji weke ciwanekî dihate naskirin. Ew êdî weke mirovekî mazin dihate nas kirin. Lê ew hê ciwan bû. Ji ber vê yekê, her dere ku diçûyê de, ku diaxift û dihanî ser ziman mirov ji xwe acêmayî dihişt. Mirovên ku lê dihisandin, her weha digotin, "ma gelo ev dibe? Mirovek hê ku wilqasî ne zêde mazin karê wêq asê bi zane bibe." Hinek mirovan, ji vê yekê re bersive ku di serê xwe de di dît ji weha bû. Di gotin ku "ew şêx e, xwûdê aqilekî wilo mazin kiriya serê wî de. Ew hê ji deme xwe yê biçûk ve tevî aliman bûya. Ev ji baxtê wî yê ji xwûdê ye ku dayê de". Ji mirovên ku di derbarê wî de diaxiftin êdî weha dihata ser ziman. Êlî Herîrî, bi wê zanebûna xwe re û wê temen biçûkatîya xwe re ku pir mazin bi zane bûya, bala mirovan dikişanda ser xwe di wê heyemê de. Gotinên ku wî digotin, qey ji devê zanistekî ku bi deh salan di nav zanebûnê de çûyî derketiba. ..

Êlî Herîrî, piştî ku wilo biryara xwe û kira serê xwe de ku wê herê Şamê ji êdî wilo zêde namêne û piştî ne bi gelekî re dikeve rê de û diçê ku herê Şamê. Piştî dikevîne rê de û diçûna şamê. Deme ku ew dikevîna rê de ku herina Şamê, êdî piştî ne bi gelekî re digihîna wir. Yên ku çûba Şamê, êdî wê derfet bidest xistiba ku çûbû û Xelîfe ji bidîta. Her weha ev yek ji hebû. Wê ew derfete Êlî Herîrî ji çêbû ba. Wî ji ew yek dixwest. Aliyekî çûna wî ji ji ber vê yekê bû. Lê Çend navêndên ku zanistên û alimên musulman yên ku lê digihîna hevdu hebûn. Şam, baxda, Riha, Cizîre bota Medîne û Mekîh û hwd. Hinek deverên din ji hebûn. Lê yên sereke ev bûn. Riha warê Birehîm Xelîl bû. Cizîre bota warê Nebî Nuh bû. Tirba wî li wir bû. Baxda, ji piştî ku Hasan û Hûseyin hatina Pekrawan kirin di şerê kerbalê de, êdî weke navende ku ji wan mayî û cihê Xelîfetiye hatibû nas kirin. Di vir de, divêt ku mirov vê yekê bênine ser ziman û bêje, ku bi vê yekê weke ku du navêndên xalîfetiye afirî bûn. Herdû navend ji jev nexweş bûn. Yekê li ya din ne dihisand.

Lê divêt ku mirov bêje ku herdû navend ji ji bo alimên mazin cihên lev kombûnê bûn. Kurd ji, di wê heyemê de serwerî û serdestiyaka wan ye pir mazin hebû. Bakûrê kurdistanê bi tavahî nêzî rêveberiya xalîfe ye li alîyê şamê wan deran hatibû ava kirin. Lê aliyê Başûr û rojhilatê kurdistanê ji, bi têgihiştine Mezhebê nû yê bi navê wê bû Şîî mazin dibûn. Bi vê yekê ew ji bûbûn hêzeke mazin. Kurd, hêze olî ye herêmî bi dergahên xwe di

destê xwe de digirtin. Li Başûr û rojhilatê kurdistanê ji wilo bû, û li aliyê bakûr û başûr rojavayê kurdistanê ji wilo bû.

Êlî Herîrî, piştî ku digihê Şamê êdî di cih de bi yên ku pêre ne, diçina navende mazin ye ku alim û mazin lê diman. Ew deme ku hate wir, li wir, pir baş ji aliyê rêveberiyê ve ji hatibû pêşwazî kirin. Ew ne bi tenê hatibû wir, ew bi şêxê Heranê yê mazin re ku bi hev re ji Cizîre bi hatibûbûna Heranê hatibûbûna wir. Ew ji li wir pir mazin dihate nas kirin. Ne tenê kurdan Arabên herêmê ji rêzeke mazin didanê de.

Deme ku ew hatibû wir di wê heyemê de, êdî rastî heman rêzê hatibû. Piştê bi hev re çûbû bûna navende û li wir bi hev re çûbû bûn cihê ku wê çûbanê de. Li wir, Êlî Herîrî û Şêx Bi hev re rastî eleqeyeke mazin tên. Pir baş têne pêşwazî kirin. Piştê ku ew diçina wir, êdî ne bi gelekî re ew têne nav Alimên mazin yên ku navê wan ji sînôrê xwe derbas kiriya. Ew ji têne nav wan û bi wan re dirûhin. Êdî bi hev re di kevina danûstandinê de. Êlî Herîrî, di wê heyeme ku ew bi hev re dikevina danûstandinê de, di serî de, ew di cihê xwe de bi bêdeng dimêne. Ew hê ciwan tê berçav. Yên ku lê dimeyîzênin, qey çavên wan ji wî têt nabin, êdî wilo zêde pêre eleqeder nabin. Lê ew ji di nav wan de li cem Şêxê mazin rûniştîya û li yên ku diaxiftin di hisêne. Ew çî dibêjin, ew di serê xwe de digirê.

Êlî Herîrî, demek têve diçê û axiftina di nav wan aliman de zêde dibe, êdî deme ku ew bi hev re diaxivin û carekê ku di wê deme axiftinê de ku di wê germbûna axiftinê de ku Şêx ji mafê axiftinê digirê û diaxivê, piştê Êlî Herîrî, mafê axiftinê dihildê û diaxivê. Deme ku ew mafê axiftinê dihildê û diaxivê, di serî de, her kesek wî weke ciwanekî dihasibêne û wilo zêde berê xwe nadiyê de. Lê deme ku ew mafê axiftinê dihildê û diaxivê û di axiftina xwe de pêde diçê, êdî balên herkesekê li wir bi carekê re di zîvirina ser wî di wê heyemê de. Lê Êlî Herîrî, weke ku ti kesek li dora wî nîn e, di serê xwe de di nav hizir û ramanê de diçê û têne ser ziman. Weke demekê wilo diaxivê û piştê dimêne sekinî. Deme ku ew axiftina bi dawî dike, yê ku pêşî mafê axiftinê dihildê û jê re dibêje "rehm û berekete xwûdê li ser te bê!" û dimêne ser ziman. Piştê yên li dora wî ji yên ku alim in, berê xwe didina wî û pêre bidest axiftinê dikin. Piştê ew ji êdî berê xwe didinê de û ji ser wî nabin. Êlî herîrî piştê êdî ji wan re ji diaxivê û axiftinna pir bizanebûn dike. di wê heyemê de heyran û taqdira herkesekî dikişêne ser xwe di wê heyemê de. Piştê ku alimên dora wî berê xwe didinê de û pêre dikevina dan û standinê de û hinek ku pêre dikevina dan û standinê de, êdî piştê ew fahm dikin ku ew çend bi zanebûn e. Piştê êdî eleqeyeke pir mazin jê re didina nişandin.

Lê her kesek ji jê dimêne acêmayî ku mirovekî ku hê wilo ciwan ku wilqasî mazin bizanebûn bûya. Ji wê herkesek dimêne acêmayî. .. Di vir de, divêt ku em ji bîr nekin û bênine ser ziman bidest nivîsandinê ji kiribû. Di wê heyemê de bi wê xweşgotin û axiftina xwe re bidest nivîsê ji kiribû. Ew zimanê xwe yê xweş û delal bi gotinên pir xweş û xweşik û bizanebûn bidest rijandina ser rûpel ji kiribû di wê heyemê de. ..

-----o0o-----

Êlî Herîrî, piştî ku hatibû şamê, êdî li wir demeke xwe buhurandibû. Li wir bi gelek mirovên zanist yên ku ji herêmên din dihatina wir, ew dîtibûn û bi wan re rûniştibû û dabû û standibû. Bi vê yekê, wî demeke xwe li wir buhurandibû. Li wir, weke ku dihat ser ziman, wî gelek keremet ji ji mirovên dora xwe re bi xwe dabûbûn nîşandin. Di wê heyemê de gelekî mazin navê wî derdikeve. Piştî ku ew wilo di cara pêşî de li ber şêx û alimên musulman diaxivê û bala wan dikişêne ser xwe, êdî piştî wê li wir dihelin. Weke demekê nalînin ku ew ji wir herê. Li wir ji, di wê heyemê de gelekî pêşketineke mazin li şamê bixwe ji hebû. Li wir ji, ji deme derketina musulmanetiye hate wê demê, gelek zanist derketibûn û hema bêja bi zêdeyiyên wan ji riya xwe bi wir ji xistibû. Li wir ji, deme ku hatibûbûna wir, çawa ku her zanistên ku dihatina Cizîre bota li wir, ji xwe di pirtûkxaneya wir tiştêkî ji wan ku mirov karê jê wan û hizir û têgihiştina wan fahm dihiştin, li wir ji, bi heman awayê rewşek afirî bû.

Zanistên musulman, pir mazin di wê heyemê de diafirandin. Gotina Hz Muahmed, ye ku ji wan re gotibû û gotibû ku "rastiyê lê bigerihin û fahm bikin û bênine ser ziman" di serê wan de weke gotinaka rênîşan dihat dîtin. Bi vê yekê, yên ku bi musulmantiyê ve girêdayî bûn, li ser riya rastteqniyê diman û her weha her timî li rastiyê digerîyan û dihanîn ser ziman. Ew hizrên xwe ji dihanîn ser ziman. Li ber zilm û zordariyê sekinîn ji weke xosletekî zanistên deme yên musulman bû. Bê mafê wan ti carî rast ne di dît. Rêzê mirovan ji hev re pir mazin hebû. Hê ev nêzîkati û kirinên deme Hz. Muahmed ye bi navê "asra saadetê" nîşaneyên xwe didana nîşandin. Lê piştî ku Hz. Muhammed ji dinyê çûbû daxiretê, êdî li dinyê ji, di demê de ew deme ku jê re dihat gotin asra saadetê hinekî weke ku li şûn mabû.

Lê hê ji yên ku zanist bûn û ew dem fahm kiribûn û ji wê demê bi agahî bûn ew dem dihanîn ser ziman. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Bi vê yekê di wê demê de bi vê yekê rewşek ji hebû. Êlî Herîrî,

piştî ku hatibû wir, êdî li wir, hinekî dî navê xwe mazin kiribû û hatibû nas kirin. Hinekî dî ji navê wî derketibû. Navê wî di wê heyemê de bi zanebûna wî pir mazin derket. Êlî Herîrî, di wê heyemê de çawa ku li Cizîre bota hinek nivîs li şûn xwe hiştibû û hatibû Rihayê û li wir ji hinek nivîsên wî mabûn, bi heman awayê li wir hinek nivîsên wî ji bûbûn. Ew ji li wir ji aliyên alimên musulman û zanistên deme ve pir mazin li berçav dihatina girtin û xwandin. Vê yekê, mirov karê bi teybet bêne ser ziman. Lê di wê heyemê de, divêt ku mirov bêne ser ziman ku navê wî pir mazin derdikeve. Êdî ji wir pêde, navê wî ji sînore kurdsitanê ji nav kurdan derbas dibe û li herême belav dibe. Rêzeke mazin u ji her mirivên li dora xwe dibîne û digirê. Bi vê yekê her weha ew mazin a û bi nav û deng e. Li wir, piştî ku her weha bi zanebûn û zimanxweşiya xwe tê nasîn, êdî li wir, faqa û mirovên zane yên li wir û yên ji wir ji li dora wî dibina kom û lê dihisênin. Ew li wir ji, bi gotin, axiftin û nêzîkatiyên xw re hin nêzîkatiyê bi perwerdehî dide nîşandin. Di wê deme kin ye ku li wir mabû de, gelek mirovên ku dayimî dihatina cem û lê dihisandin êdî xwe weke faqiyên wî ji di dîtîn. Piştîre wilo êdî navê wî ji derdikeve. Ew mazin tê nas kirin. Bi vê yekê re, di wê heyemê de li ser navê Êlî Herîrî, vegotinek ji tê vegotin û têtogin ku rojekê deme ku faqiyên wî deme çûna hacê tê û diçina hacê, hinek ji wan wî li wir dibînin. Lê piştîre deme ku divegerihina malê. Êdî ji dora xwe dibêjin ku "ne şêx Êlî herîrî ji hatibû hacê û xwûdê Hacê wî ji erê kir." Li ber vê gotina mirovên ku ew weke ku li wir dîtina herkesek li yên dibêjin dimêne şaş û mat. Ji ber ku di wê heyemê de Êlî Herîrî li cem wan bû. Ew ji dibêjin ku "ew li cem me bû" û di ya xwe de isrer dikin. Piştîre, ev gotin diçina guhê zanistên mazin yên li wir ji. Ew deme ku lev dirûnihin û dibêjin ku "ma ka ev yek çawa çêdibe", êdî di wê heyemê de yek ji nava wan aliman ku ew ji çûya hacê, mafê axiftinê digirê û dibêje ku "ne ez ji çûbûm hacê û li wir bûm. Min ji ew dît". Bi vê gotinê, êdî hemû alim û yên mazin digihine wê têtgihiştinê di nava xwe de ku ew alimekî ku pir mazin ku ji aliyê Xwûdê ve hatiya dîtîn e. Her weha ê bahsa wî dikin û rêz û hûrmeteke hê maztir êdî jê re didina nîşandin. ..

Piştî kiu ev rewş bû, êdî navê wî pir mazin hê maztir li herême tê bihîstin. Ji herême êdî pir mazin bahsa tê kirin. Êlî Herîrî, li wir, êdî weke ku ew di mêne de, êdî pir mazin navê wî derdikeve. Êdî ew li wir weke alimekê mazin tê pêşwazî kirin û nêzîkatiya bi hûrmet ye pir mazin jê re tê nîşandin. Ji wir, êdî piştîre ev xaber û vegotin diçina guhê Xalife ji, li wir ji êdî bashsa wî ji tê kirin. Xalife ji di wê heyemê de dixwezê ku

wî bibîne. Êdî ew ji nabêje na û di demekê kin de rê digirê bi gelek mirovên li dora xwe re û diçê cem Xalifê û wir ji bi pîroz tê pêşwazî kirin. Her weha mazin tê nas kirin.

Êlî Herîrî, ku di wê heyemê de li cem Xalifê ji demekê dimêne, piştê êdî divegerihê. Lê ew êdî dixwezê ku vegekihê Cizîre bota çareka din. Piştê, ew bi Şêxê heranê re êdî ku demek têve naçê dike ku vegekihê.

Di wê heyemê de, li herêmê pir hêrîşên ku komne weke komên Mogolan hene. Ew ji hem li derne kurdistanê û hem ji hata ku digihîşt ber şamê Hêrîşên wan hebûn. Bi hêrîşên komên wilo yên ku hêrîşî navenên herêmî dikirin, zirereke mazin digihîşt hem mirov û hem ji mal û semyenên wan di wê heyemê de.

Di wê deme ku Êlî Herîrî li şamê ya, her weha hinek hêrîş ji dibin. Ew hêrîş ji, her weha zirereke mazin didina herême. Lê rojekê, tê gotin ku Êlî Herîrî, mirovên li dora xwe yên herême hemûkan lev dide hevdû li ber xwe û ji wan dixwezê ku hêzeke mazin di nav xwe de ava kin û çêkin. Bi vê yekê, êdî wan têne cem hevdû û hêzekê ji wan diafirêne. Piştê ku ew ji di nav de, tê gotin ku diçê û bi yên ku sereke bû li ser serê komên mogolan ku hêrîş dihanî ser serê herême pêre hevdîtîne dike û dibêjiyê de "ku ji dev ji hêrîşên xwe berde, lê wekî din ku berdewam bike wê xwûdê wî pir mazin bi ceza bike". Lê tê gotin ku ew yê ku sereke ji wan re vê yekê erê nakê û ji ya xwe nayê xwerê. Piştê, êdî herîrî dibêjiyê de "hata sibe, bila tişte ku di bibîne ji te re bibe fêrek, da qana ti aqil bigirê". Û ji wir diçê. Lê piştî ku Êlî herîrî wilo dibêje û dike ku ji wir ji cem wî derkeve û herê, dibêjin ku wî ne xwestiya ku ew ji wir herê û xwestiya ku herê bi ser wî de. Êdî tê gotin ku di wê heyemê de, dinye xawr dibe li berçavan û weke ku bihejîjê lê tê. Ji vê yekê êdî ew mirovên li dora wî ne, tê gotin ku hemû ji êdî dilê wan bitirs dibe û piştê ji hev re dibêjin ku "ev alimek e, êdî xwûdê ji me stand" û bi şûn ve hav diavêjin. Piştê serekê hêze mogolan ye ku hatî bi ser wir de, deme ku Êlî Herîrî derdikeve, êdî dibîne ku wa mirovên herêmê hemûkan xwe weke şervanan girêdana û wê li pey Êlî Herîrî hatina. Êdî tê gotin ku ew wilo dibîne, êdî tir dikeve dilê wî de û ji wir êdî bi hêze xwe ve divekişihê.

Piştê Êlî Herîrî bi yên ku pêre çûya, êdî di vegekihê û tê nava mirovên ku wî lev dana hevdû û li pey wî na. Ku tê wir ji, êdî yên ku pêrene, tênine ser ziman ku Êlî Herîrî, çawa kir ku tir bikeve dilê wan de û çawa nîşanak şanî wan dan. Bi vê yekê re, êdî Êlî Herîrî, pir mazin rêzek jê re tê nîşandin. Piştê ji ber wê yekê û kirina wî ye bi wêretî,

têgotin ku Xalifê bixwe ji tê ber wî û rêz û hûrmete xwe ji wî re dide nîşandin. ..

Êlî Herîrî, piştî wê rewşê re, ji xwe êdî zêde li wir ji namêne. Dike ku vegehihê malê. Ew êdî kara xwe dike ku Şêxê Heranê re vegehihê û were Kurdistanê. Piştî êdî ne bi gelekî re ew êdî bi hev re careka din têne Rihayê. Wê carê ji weke ku tê gotin demekê li wir dimênin. Piştî, êdî ne bi gelekî re di deme ku ew kara xwe dike ku bi mirîd û sofîyên li dora wî na re, dike ku were Cizîre bota, di wê heyemê de hinek zanist û alimên ku xwe li ser rê kirina ku herine başûr û rojhilatê kurdistanê kurdistanê hene. Ew ji deme ku wan wilo dibîne, êdî ew ji jê tika dikin ku ew tevî wan bibe. Yê ku xwe kar kiribûn, elek zanist û şêx û mirîd û sofoyên wan bûn. Deme ku ji Şamê di vegehihin, hêzeke ku xalife dabû amede kiriin, wan têne wir biawlakarî. Piştî êdî ku ew ji Êlî Herîrî dixwezî, êdî Êlî Herîrî ji wan re nabêje na û piştî êdî ew bi hev re dikevîne rê de û pêşî diçîna rîya xorasan û rojhilatê kurdistanê digirin. De ne, Xorasan, her zanistê demê yê ku hebû, xwe digihanda wir. Ew der, pir mazin bi nav û deng bû. Pêşketinaka mazin ye dîrokî bi hizir û têgihiştinê li wir ji hebû. Ti zanistî û alimî ji ne dixwest ku xwe ji wê zanebûn û têgihiştinê bêpar bihêlê. ..

Êdî ku Êlî Herîrî ji di nav wan de êdî ew dikevîna rê de û berê xwe didina Xorasanê başûrê kurdistanê ve.

-----oOo-----

Êlî Herîrî, piştî ku tê ku were Xorasanê, êdî piştî ne bi gelekî re tê Xorasanê. Li wir ji, bi yê ku bi wan re hatiya demekê li wir dimêne û mirovên wir ji nas dike û xwe ji bi wan dide naskirin. Piştî, ku hinekî li wir dimêne, piştî êdî ne bi gelekî re hinekî bi şêx, mirîd û sofîyên ku pêre ne re, demekê li rojhilatê kurdistanê digerihê. Li wan deran ji dimêne. Piştî ji wir diçê Di buhurê başûrê kurdistanê Zaxoyê. Li wir ji demeke demekê dimêne.

Êlî Herîrî, deme ku ji rojhilatê başûr, êdî li başûr, weke demekê dimêne. Ew demeke xwe ye dirêj li wir li herême Sora ji di buhurê. Li wir, demeke xwe ye ku ne nêzî dem dirêjiya wî ye ku li Cizîre bota mabû dimêne. Li wir, di wê deme ku dimêne de, hate ku bi navê wî hinek dergah ji têne vekin. Ew her weha li wir, weke ku li Şamzînanê bê dimêne û di nav xalkê de tê nas kirin û cih û war digirê.

Di wê heyemê de, li başûrê kurdistanê ji pêşketineke mazin hebû. Herêmên weke Duhok, Hewlêr, Zaxo, Musil û hinek herêmên din ji ku di

nav de pir pêşketineke mazin jîn dikir. Li wir, demeke xwe ye pir dirêj dimêne. Li wir, di wê deme xwe ye ku dimêne de ji karê xwe yê nivîsandinê ji zêdetir dike. Li wir, li dergahên ku ew lê dimêne, aqilê wî yê ku dihate nivîsandin û yê ku dihate ser ziman ji wî, weke temenê perwerdekirinê di nav faqa û sofîyan de dihate bikar hanîn. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Di wê demê de başûrê kurdistanê, ji aliyê pêşketin û pêşve çûn û bi pêşve birinê de bûbû xwediyê cihekî teybet. Ji xwe piştî pekravankirina Hasan û Hûseyin, êdî bi tememî bi rojhilat re başûr di herêmê de dibe xwediyê cihekî teybet. Di pêşketine demê de weyneke mazin ye dîrokî di leyizê. Başûr, bi rojhilat re, bi wê têgihîştine xwe re temenê wê împaratorbûna sefeviyan ji diavêje. Divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Ji wê demê pêde, êdî hin bi hin dem bi dem pêşetin bi vê yekê derdikevine holê. Lê di wê heyemê de, wilo zêde ne evder, bi teybetê ji bakûrê kurdistanê bi dewletbûna wê ye bi navê Merwanî re derketibû pêş û li ser serê wê herêmê ji xwediyê serdestiyê bû. Her weha divêt ku mirov vê yekê bêne ser ziman. Lê di demê de, çendî ku rêveberiya Merwaniyan bi hêz û qudreta xwe kêmbûnê û serdestiya xwe winda dike, êdî bi wê kêmbûna wê re di qada rêveberî ye rêzanî û dewletbûnê de valabûna ku derdikeve holê, êdî bi şînbûn û derketina sefeviyan mazin dibe. Lê di wê demê de, piştî Merwaniyan ji, Çend ku kurdên başûr û rojhilat ne bi awayekî fermî yê Împaratorî bi hebûn ji bûn, dise mirov karê bêje ku di nav xwe de bi wê têkilî û bi hev re bûna wan ye ku bi awayekî qonfaadaralî heman rewş derketa holê. Piştî merwaniya ji, kurd wê hêz û qudreta xwe ye ji serwerbûn û serdestbûn xwe winda nekin. ..

Lê di wê heyemê de temenekî mazin yê împaratoriyê bi pêşketine şîtiyê ku dergahên kurdan wê mazin dikirin, derdiketa holê. Di wê heyemê de, weke navendne pêşketî hewlê, Duhok, Zaxo ku hebûn ji, lê bigiştî êdî hin bi hin baxda derdiketa pêş. Baxda, piştî hasan û Hûseyin re wê bê navendeke mazin li herêmê. Ew der, weke naveneke mazin derdikeve pêş. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Awayê xalîfetiye bi mezhebê nû yê şîtiyê re li Baxdayê xwe bicih dike.

Êlî Herîrî, piştî ku hatibû herêmê êdî li herême wî demeke xwe ye dirêj buhurandibû. Her weha mirov divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Zimanê Êlî Herîrî, wî li wir ji mazin derdixe pêş û di nav xalkê de mazin dike û navê wî derdixe. Êlî Herîrî, li wir di wê deme ku ew li wir dimêne de pêşketineke mazin dijî û pê mazin dibe. Ew di wê heyemê de,

êdî ne tenê ciwanekî ku hê ji nû mazin bûya ya. Ew êdî yekî balixbûya û bizanebûna xwe ji her weha bi heman awayê ew balixbûn jiya ya. Divêt ku mirov vê yekê her weha ji bo bi teybet bêne ser ziman. Êlî Herîrî, di wê heyeme xwe de di deme xwe ye li wir de, deme ku pir mazin li wir dijî. Li wir, pir mazin pêşketinekê di xwe de jn dike. Ew deme wî, demeke nû, mirov karê bêje ku di şaxsiyeta wî de ji dide dest pê kirin.

Lê Ev deme Êlî Herîrî, deme ku mirov wê bêne ser ziman, mirov wê bi van pêşketinên demê re ji bêne ser ziman. Ew deme ku diçê başûrê kurdistanê, li wir, êdî bi wê pêşketine ku heya re di serê xwe de dikeve têkiliyê de. Her weha mirov divêt ku vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Deme ku ew bi serê xwe re dikeve têkiliyê de, êdî piştire hin bi hin xwestina wî ye têde kur çûyin ji derdikeve holê.

Êlî Herîrî, piştî ku demeke xwe li başûr weha di buhurêne, piştire êdî weke ku ew têgihiştine herême ye ku heya fahm dike û êdî ew di xwe de ji derdikeve ser wê. Ew di serê xwe de xwediyê têgihiştineke pir mazin ye civaknasî ji ya. Di vir de divêt ku mirov vê yekê ji bêne ser ziman. Ev deme wî ye li başûrê kurdistanê bi pêşketine wî re ku tê ser ziman û bi hatina ser ziman re ku tê berçav ji, êdî mirov vê yekê her weha têdigihê.

Êlî Herîrî, di serî de divêt ku mirov bêje ku wî civaka xwe pir mazin û baş fahm kiriya. Wî di serê xwe de ew bitêgihiştin bicih kiriya. Bi vê yekê re ji mirov karê bêje ku ew têgihiştineke bi pergala ye biazil û têgihiştinê wê di xwe de daya rûnandin. Êlî Herîrî, her weha mirov karê wî bêne ser ziman.

Mirovê zane yê ku civaka xwe fahm kir û têgihiştine wê bi dîroka wê û jiyana wê ye ku buhurtî û ye ku di wê demê de dijî ji ku fahm kir, ew hingî karê bibe xwediyê weynekê di pêşketin û pêşvebirina civaka xwe de. Her weha mirov karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Êlî Herîrî, di vir de deme ku mirov çend gotinna ser wî bêne ser ziman, mirov karê bêje ku ew pir bi têgihiştin bûya. Di wê deme xwe de, ew xwediyê pêşketineke mazin a. Ya wî derdixe pêş ji evnakê ya. Her weha mirov divêt ku vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman.

Êlî Herîrî, ku mirov wê hizre wî ye civaknasî fahmneke, mirov wê têgihiştine wî ji baş fahm neke. Ew di têgihiştine xwe de bi têgihiştineke felsefî nêzîkatiyê li civakê û li mirovên li dora xwe dike. Ew di têgihiştine xwe ye civaknasî de xweza ya. Ye ku hizre wî bi awa û şekl dike ji ev yeka ya. Ew têgihiştine hizir li nêzîkatiyên xwe yê li xalkê dike û dide nîşandin. Di gotin û vegotine xwe de li gor dîtina xwe ya.

Baweriya xwe ji ku têne ser ziman, bi zimanekî xweş ku yekî ku evindar çawa ku evina xwe têne ser ziman, her weha ew têne ser ziman.

Di wê demê de, mirov vê yekê bêhtir pêre dibîne. Ew vê yekê dide berçav. Êlî herîrî, di deme xwe ye li başûr de demek jiyana xwe ye teybet dijî. Êlî Herîrî, xosltekî wî heya, ew di pêşketine xwe de astangan li ber xwe û li pêşiya xwe nasnakê. Mirov vê yekê bi teybet karê bêne ser ziman. ..

Êlî herîrî, ku demeke xwe li wir li başûr li herême sora dimêne, piştêrê êdî dike ku xwe bigihêne Baxdayê ji û wir j bibîne. Her weha hin hewldanên wî hene. Ew êdî di xwe de bûya xwediyê zanebûnaka mazin. Bi wê zanebûnê ji, her weha êdî piştêrê dderdikeve pêşiya mirovên li dora xwe di wê heyemê de. Li Baxdayê ji gelek zanistên herêmê yên ku mazin û navê wan hebû levdicivîyan.

Êlî herîrî ji, heya wî ji wê hebû. Heya wî jê hebû ku mirovên mazin û yên zane ku li wir hene. Ewder ji, bûbû weke navendeke xalifetiyê. Ji deme Xaro Raşîd ve navê wî bi xweşik dihate ser ziman û di seran de cih û war digirt. Lê wilo dewam nakê. Piştêrê hin bi hin di devrên din de hin bi hin tê guhartin. Lê di wê demê de hê ji wilo li ser xwe ya.

Êlî Herîrî, piştêrê ne bi gelekî re ew êdî bi tememî dike serê xwe de ku herê û xwe bigihêne wir û wir ji bibîne. Piştêrê ne bi gelekî re êdî ew dise dikeve rê de diçê Baxdayê. Ew deme ku diçê wir, êdî weke zanistekî diçê. Weke zanistekî, ku êdî ji xwe bi bawer diçê wir. Li wir, êdî ku diçê û digihê wir, êdî piştêrê ne bi gelekî re li wir ji tê nas kirin. Bi zimanê xwe yê xweş li wir bala mirovên li dora dikişêne ser xwe di wê heyemê de. Li wir, di wê heyemê de gelek mirovên mazin û yên zane hene. Êlî Herîrî, deme ku ew diçê wir, êdî li wir bi awayekî mazin tê naskirin. Di wê heyemê de ji, pêre hinek nivîsên wî yên ku nivîsandina pêre hene. Ew nivîsên wî ji heya mirovên li dora wî jê dibe û dixwênin. Bala wî zimanê wî yê pir bizane û xweşik pir dikişêne. Di wê heyemê de, di deme ku digihê Baxdayê de, êdî bi naskirina wî û xwandina nivîsên wî, êdî bala zanistên li wir yên ku bi temenê xwe ji û biazilê xwe ji mazin in diçina ser wî.

Di wê heyeme ku her weha bal diçina ser wî de, êdî piştêrê ne bi gelekî re gelek niqaşên ku bi wî re dibin û yên li ser wî dibin hene. Êlî Herîrî, bi awayê hanîna xwe ye li ser ziman ye hizre xwe ye olî û baweriya xwe, pir mazin dikeve ber balan de. Ew aliyê wî, li ser niqaş di wê heyemê de dibin. Êlî Herîrî, pir xweşik têne ser ziman. Maqamaka wî ya pir xweş heya. Ev hemû dibina mijara niqaşan. Hinek zanistên wê

deme yê li wir ji, di wê heyemê de di wan nîqaşan de dibêjin ku her weha "bi zimanekî wilo hanîna ser ziman ye hizre olî, ne baş a". Bi vê yekê hinek nîqaş derdikevin. Êlî Herîrî ji, di wê têgihîştinê de ye ku bi awayê herî xweşik hizre wî ye olî hanîna ser ziman maf dike. Bi vê yekê, hinek nîqaş derdikevina holê. Lê piştê ji ber ku gelek zanistên herêmê ya Êlî Herîrî ku wilo xweşik hanîna ser ziman rast dibînin, êdî ew di wir de derdikeve pêş û yê li ber wî disekinîn ji, li şûn dimênin.

Êlî Herîrî, deme ku ew li wir li Baxdayê dimêne, her weha demekê di buhurêne. Gelek nîqaş û danûstandin hem pêre û hem ji li ser wî û zimanê wî dibin. Lê di dawiyê de, ew weke yekî zanist û alim li wir ji tê naskirin û rêz û hûrmet jê re tê nîşandin.

Êlî Herîrî, di serî de, di deme ku li Baxdayê di mêne de, ew hingî, hinek nivîsên wî yê li aliyê hinek zanist û alimên wir ve têna xwandin ji, hingî wî xweşik û sipahî û bizanebûnaka mazin nivîsandiya, êdî hinek ji wan bawer ji ji nakin ku ew nivîs wî nivîsandina. Ji ber ku ew hê ciwan a û ew nivîsên ku wî nivîsandina, bi zanebûna kalekî mazin û bi pir zanebûn hatina nivîsandin. Bi vê yekê, hate ku birrek ji alimên li wir lev ji digihine hevdû û li ser wî bidest danûstandinê dikin. Hate ku tê gotin ku di nav wê koma alimna de ji yê li ku dibêjin ku "wî ev nivîsên wilo bizane ne nivîsandina ji derdikevin". Lê yekî di nav wan aliman de heya û pir pîr û kal û bizane ya. Wî aqildanti ji ji xalîfe re dikir. Yekî ku pir mazin bû. Rêz û hûrmeteke mazin ji jê re hebû. Ew ji navê wî biqasî ku jê re dihate gotin "Şernad" bû. Ew ji bi aslê xwe ji başûr kurdistanê bû. Ew demeke ku dirêj bû li baxdayê li xalîfetiyê dijî. Li wir, deme ku wilo ji bo Êlî Herîrî tê vegotin, êdî Ew mirovê pîr û zane ji mafê axiftinê digirê û weha ji mirovên dora xwe yê li alim û zane re dibêje:

"Win hinek ji wa dibêjin ku ew hê yekî ku ne wilo zêde mazin a ku ew nivîsna weha mazin û bizane binivîsêne. Lê riya fahmkirina vê yekê heya. Bila win alimên zane yê li vir ji ku hemû ji di nav de û "qadi"yê me ji di nav de bila komekê ava kin û bila ew kom li wî bikisêne. Ji zanebûna wî ye ku hatî nivîsandin û di çerçova wê de, bila jê bê pirsîn û bila êdî rastteqînî derkeve holê. Ku neyê wî bin, bila qadi çî ceza jê re dive bila bidiyê de. Lê ku rast gotibe, bila hingî ji rûmete wî jê re hê maztir û bi rêzeke mazin bêdayîn".

Ku wî wilo got, êdî wan mirovên din yê li dorê ji ev hizir pir rast û di cih de dîtin û piştê êdî di cih de xaber şandina pey qadi û ku were wir û êdî lev gihana hevdû û piştê bakirina Êlî Herîrî û lê hisandin. Deme ku lê hisandin, êdî Êlî Herîrî di nivîsên xwe yê li ku di wê heyemê de di destê

wan de bûn, hemûkan ji weke ku jiber ji wan re dihêne ser ziman. Piştê her zanist û alimên li wir çî tê aqilê wan ji Êlî Herîrî di pirsîn. Demeke pir dirêj her weha danûstandin di naqabîna wan de dibe. Piştê tê fahm kirin ku ew zanebûn zanebûna wî bixwe ya. Êdî herkesekê li wir lêborîna xwe ji wî dixwezê û piştê bi rêz û rûmete mazin ye ku mahçûbîyeta wan ye li ber wî ji di nav de tê ser ziman, tê nîşandin ji wî re.

Hate wê heyemê, di derbarê kirin û jiyana Êlî Herîrî de, li wir, wilo zêde ti tiştê ne dihate zanîn. Di derbarê kirinên wî yê ku Şamê de ji ti zanebûn di wê kêlikê de nebû. Piştî wê rewşê de bi hinekî re piştê pê hisandin dibe û yê ku wê ji wan aliman re têne ser ziman ji Xalîfê xwe ya. Di wê heyemê de, her gotina xalîfe ye ku ji bo Êlî Herîrî tê ser ziman tê qeydkirin û nivîsandin. Bi wan gotinên Xalîfe, êdî Êlî Herîrî êdî li Baxdayê ji weke alimekî mazin û pir bizane tê naskirin û ser ziman. Ew êdî li wir ji weke zanist û alimekî ku li ser aliman re tê dîtin û ser ziman. Êlî Herîrî, biqasî ku ji bo deme wî ye li Cizîre bota, Riha û Şamê hinek keremetên wî têne ser ziman, her weha di deme jiyana wî ye li Baxdayê de ji her weha hinek keremet jê bilêv dibin. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha bi teybet bêne ser ziman. Êlî Herîrî, di wê heyemê de bigotinên xelîfe yê li ser wî re ji, di nav xalkê de êdî weke alimekî deme xwe yê herî mazin navê wî derdikeve. Ew alim û zanistekî ku di asta herî bilind de tê ser ziman a. Bi vê yekê, re rêz û hûrmetê bîmaf dike. Ew mirovekî pir mazin bi rêz û hûrmet bû. Weke ku di nav alim û zaneyên deme de dihate ser ziman ji bo wê, dihate gotin ku "xwûdê, ji zanebûn û mazin bûnê ew bixelat kiriya di nav mirovên zane û aliman de. Ew stêrkeke ku xwûdê bi nûre xwe birohnî kiriya li dinyê. ..".

Êlî Herîrî, weke demekê li wir li Baxdayê dimêne. Li wir di wê heyemê de pir mazin tê nas kirin. Ew êdî alim û zaneyekî ku xwe ji xwe ji buhurandîya. Wilo ji bo wî dihate ser ziman. Bavê wî ji wilo bû. Ew ji alim û zaneyekî ku xwe ji xwe ji buhurandîbû. .. Rehme xûdê lê bê û cihê wî bihuşt bê.

Êlî Herîrî, piştê ku demekê li wir dimêne, êdî bi zanebûna xwe ji xwe hinekî dî ji mazin dike, piştê dike serê xwe de ku vegehihê Şamzînanê. Lê di dilê wî de hebû ku careka din wî xwe bigihanda Cizîre bota. Her weha weke xemakê ji pêre çêbû bû. Ew xema wî ji, çend ku diçû, pêre mazin û bi hêz dibû.

Piştê ne bi gelekî re, êdî Êlî Herîrî, li Baxdayê di nav alimên li wir wî ne, ew çûna xwe li ber wan têne ser ziman. Deme ku têne ser ziman, dike ku dilê herkesekê li wir ku di wê heyemê de li dora wî bûn hinekî bi

xamgîn bibe. Lê Êlî Herîrî kiriya serê xwe de ku vegeriya wir. Piştê ne bi gelekî re êdî bidest kare xwe ye rêwîtiyê dike. Êdî wê ew bi rê ketiba. Êdî wê ew hatiba Kurdistanê. ..

Mirovên ku hê ji Şamzînanê pêre ketibûbûna rê de yên weke mirîd û sofî ji, hê ji, pêre bûn. Ew hê ji li cem wî bûn. Wan ji, pêre rêwîtiyeka mazin û demdirêj buhurandibû.

Êlî Herîrî, deme ku kara xwe ye vegevine dikê, di wê heyemê de heya xalîfe ji ji çûna wî ye ji wir dibe û ew dibake Êlî Herîrî û hinekî lev dirûnihin li ber aqildan, aqilmend û alimên demê yên li wir û bi hev re dikevin axiftinê de. Demeke dirêj di wê heyemê de bi hev re dan û standina wan ye bihev re dibêt. Di wê heyemê de, xalîfe, jê dixwezê ku ka ew ji wî çî dixwezê. Lê Êlî Herîrî, hingî tenê gotinek ji devê wî derdikeve. Ew gotin ji her weha ya. "ye ku xwûdê daya min ji min re bes û zêde ya ji. Ez di riya xwûdayê xwe de dimşîm. Ev ji min re hemû tişt e. Di wê riya xwe de, ez xwedîyê hemû tiştê mazin û giranbûha me. Ti kesek nikarê wê tiştê ku min bizanebûn û aqilê xwe di wê riyê de bidest kiriya bide mîn. Ew ji xwûdê pêve wê ti kesek nedê. Bila baweriya lê mazin hebe ew bes e. ..." Êlî Herîrî weha dibêje û dimêne sekinî di wê heyemê de. Li ber wan gotinên wî mirovên li dora wî û xalîfe ji pir mazin bi bandûr dibe. Ew yek, xwe di rûdêna wan de pir baş û mazin dide nîşandin.

Di wê heyemê de Êlî Herîrî, ku weke demekê bi xalîfe re ji diaxivê, êdî piştê ew kara dike ku ji wir were kurdistanê û Şamzînanê. Di dilê wî de heya, ku wê bi zanebûna xwe ye ku bidest xistiya, êdî careka din xwe bigihêne Cizîre bota û bi wê zanebûna xwe êdî wêderê bibîne. Her weha ev xwestek pêre heya. ..

-----o0o-----

Êlî Herîrî, piştî ku ji baxdayê biryara xwe ye vegerandinê dide, piştê ne bi gelekî re divegerihê kurdistanê şamzînanê. Ew, deme ku di vegehiyê kurdistanê, êdî berî ku ew vegehiyê xabere vegevine wî berî digihê dergah û Şamzînanê bixwe ji. Êdî pêşi ji Şamzînanê Mîr, gelek sûwaran derdixe ku herin û xwe bigihênine Êlî Herîrî û yên pêre ku wan bi awla bênine wir.

Ew êdî mirovekî ku pir mazin navdar bû. Her gotin û hizre wî ye ku ji derdiket. Di nav xalkê de deng diveda. Ne tenê li Kurdistanê di nav xalkê de deng diveda. Li herêmê bigiştî di cihan Îslamê de deng diveda.

Cîhane Îslamê, bi wî gihiştîbû zanistekî xwe yê demî ku jê re êdî pêşengiyêke mazin ye bi bi aqil dikir. Aqilê Êlî Herîrî, her weha êdî pişt mazin di nav xalkê de tê ser ziman. Hizre wî, êdî di nav zanist û alimên demê de yê olê de bicih bû. Gotina wî, weke gotinaka pîroz û binirx dihate ser ziman û pêşwazî kirin. Ew wilo êdî mazin bû. Ew nirxekî bitêgihiştin yê olî yê deme xwe bû. Her weha ji dihate erê kirin. Di demê de piştîre, êdî cihê ku ew lê dimêne dibe weke navendeke mazin ji alim û oldaran re. Êlî Herîrî, yek ji wan mirovên herî mazin yê ku musulmanetî di demê de ne tenê li Kurdistanê li herêmê bigiştî bi pêşxist bû. Wî, bi hizre û aqilê xwe re di cihanê Îslamê de demek dabû vekirin.

Bi vê yekê, êdî mirov karê bêje ku Êlî Herîrî û rastiya wî newê fahm kirin, wê demeke pêşketine ye Îslamê wê di fahmkirina xwe de kêmbimêne. Her weha mirov karê vê yekê ji sêrî û teybet bêne ser ziman. Bi Êlî Herîrî re demeke nû li Kurdistanê û bigiştî ji li herêmê di têgihiştinê de dibe. Ev dem, têgihiştine demê û pêre ji ye olê dide kifşkirin.

Êdî wê ji vir pêde, jiyana Êlî Herîrî, her xala wê, wê bizanestî û alimiyê bi buhurê. Wê pêşengê deme xwe û zanist û alimên wê be. Wê di baweriyê de têgihiştineke bifelsefê bide rûnandin û di nav civaknasiya civakê wê bêne ser ziman. Wê deme aqil, bivac û têgihiştin wê di bawerî û olê de rûnihê û êdî bidest pêşketine xwe ye demî bike. Yê ku pêşengiyê ji vê re dike ji, Êlî Herîrî bixwe ya. Ji ber vê yekê ew pir girnge ku ew were fahmkirin û têgihiştin bi deme xwe re.

Êlî Herîrî, hate deme balixbûna xwe her weha pêşketinekê jîn dike. Êlî Herîrî, ji vir pêde, ku jiyana wî hate ser ziman, wê bi pêşketinên ku dana çêkirin û hizre ku hanî ser ziman re ew wê were ser ziman.

Ji vir pêde, êdî wê pêşketine wî bi têgihiştine wî re û wê bi pêşketinên ku di qada hizir û têgihiştinê de û bi teybetî di cihana îslamê de dide çêkirin wê werine ser ziman. ..

Abdusamet yigit, Kurdistan, Cizira bota, adara 2002
